



Armanc

Danerê Rojnameya pêşî ya
Kurdî Miqdad Mithed Bedirxan

Rojnameya Mehane

Hejmar, No: 150
Heziran-Tîrmeh
June-July 1994
Buha - Price
20 SKR, 4 DM


Li Kurdistanê pêla terorê

■ Bi girtina DEP'ê re parlamenteriya 13 parlementerên wê ji ketin. Ji wan 6 kes derketin Ewrûpayê û 2 kesen din ji hatin girtin.

■ Li dijî gelê Kurd şerekî dijwar dom dike. Karbidest û siyasetdarên Kurdan têñ kuştin. Rojname û kovarêñ wan têñ civandin û di derheqê berpirsiyarêñ wan de da'we têñ vekirin.

Dewleta Tirkîyê bi her hawî li dijî gelê Kurd şerekî dijwar dajo. Her ku diçê valabûna gundan, kuştina kesen sivil zêde dibin. Surguna "mecbûr" bûye parcey ji jiyanê. Edî gelê Kurd ne bi qanûn û bi fermanan têñ surgunkîrin, ji ber terorê ew bi xwe cih û warêñ xwe terk dikin û ber xwe didin Anadolîyê.


Di xebata legal de jî dewlet tahmûlê Kurdan nake. Rojname û kovarêñ ku dewlet zane ji alî Kurdan ve têñ derxistin, hemâ hemâ her hejmarêñ wan têñ civandin û di derheqê berpirsiyarêñ wan de dawa têñ vekirin û cezayê pereyan û hefsê ji wan re têñ dayin. Rojname Welat ji aliye DGM'ê ve mehekê hat sekinandin. Dostê gelê Kurd sosyolog İsmail Beşikçi ji ber kitêbên xwe li dehan sal hefs jê re têñ xwestin.



Muhsîn Melîk tevî şoforê xwe li Rihayê hat kuştin



İsmail Beşikçi ji ber kitêbên xwe yên li ser Kurdan bi dehan sal hefs jê re têñ xwestin.



Kitêba M. Baksi "Bi Çavê Kurdan Yilmaz Güney" ji alî DGM'ê ve hat qedexekirin û ji piyasê hat berevkirin.



Rojnameya Welat ji alî DGM'ê ve hat sekinandin.

DEP'ê nişan da ku ji tecrûbeyên HEP û DEP'ê ders nehatiye girtin.

Kuştina karbidestêñ Kurd

Piştî ku serokwezîra Tirkîyê Tansû Çiller got, lîsteya hin karbidestan heye ku ew alikariya PKK'ê dikin" yeko yeko ew karmend têñ kuştin. Beheet Canturk, Savaş Buldan, Haci Karay, Adnan Yıldırım ji aliye dewletê ve bi navê cinayetên "qesasnediyar" hatin kuştin.

Abûqatê Behcet Canturk Yusif Ziya Ekinci, serokê DEP'ê yê Rihayê û endamê Meclisa HADEP'ê Muhsîn Melîk tevî şofêrê xwe Mehmed Ayyildiz di 2'ê Heziranê e li Rihayê hatin kuştin.

Li Kurdistanê kaoseke wilo çêbûye ku kes nizane mirin ji kîjan alî ve tê. Bêbawerîtî, bêlaqayıtî, jiminreçiyitî di nav gel de pêl dide. Millet li hember bûyerên ku diqewimin lal û kerr bûne, Kurdistan wêran dibe.

Ciller tinazê xwe bi Kurdan dike

Serokwezîra Tirkîyê Tansû Çiller êdî wek rehmetiyê Ozal beyanan dide, Wexta ew derdi keve derveyî welêt, Ewrûpî wê di pirsa Kurdi de dikin tengasiyê. Ew jî mecbûr dibe ku beyanên ku ew jî nikare bi cî bîne dide. Di sereda na xwe ya Fransayê de beyanek da ku, qaço "ew ne li dijî dayîna radyo û televîzyonê bo Kurdan e". Wexta Çillerê ev gotin digot polis û leşker li Diyarbekirê kasetên Kurdi dicivandin.

Hukûneta dubaskî ya Çiller û Karayalçın di pirsa Kurdi de ne xwedî insiyativ in. Di vî warî de xwe teslimî generalan kirine. Lî carna mecbûr dibin li ser Kurdan beyanan derdixin, ew beyanên wan roja din bi ber bayê de diçin.

Li Kurdistanâ Başûr

PDK û YNK'ê li hev kirin



Bi saya dostêñ kurdan li hev kirin Foto: Medya Güneşî

Piştî şerê birakujiyê di navbera PDK û YNK'ê de, herdu alîyan hewl dan ku dîsa jiyanî siyasi ya Kurdistanê normal bibe. Parlamentoye civîna xwe ya yekemîn di 30'yê Heziranê de çêkir. Politbüro yeti herdu rêxistinan di bin seroktiya M. Barzanî û C. Talabanî de li Hewlîrê civîyan.

Di vê civînê de heyeta Enternasyonal Sosyalist (ji 3 nûneran pêkhatibû; Swêd, Fransa û Awusturya), INC, Kendal Nezan (serokê Enstituya Parîsê), Dr. Necmeddin Kerim; (serokê Kongra Niştimanî ya Kurdan li Amerika) ji besdar bûn.

Di vê civînê de li ser van xalêñ jérîn hat rawestandin:

1-Piştî vekesana çekdaran ji derdora parlamentoye, vegera parlamentoye ser karê xwe.

2-Destnîşankirina civîna seroktiya Bereya Kurdistanê.

3-Rawestandina propagandayê li dij hev.

4-Rawestandina girtina kesan. Her wisa herdu rêxistin li ser

normalizekirina jiyanê û astengên pêşîya parlamentoye sekinîn û di vî warî de pêşîyaren xwe kirin.

Piştî vê civînê heyetên herdu hêzân cûn Parîsê. Li wir di navbera 16-22'yê Tîrmehê de mu-naqşeyen dûr û dirêj kirin û li ser hin nuxteyan li hev kirin. Di hin civînan de nûneren Fransa, Amerika û Ingilîstanê ji amade bûn. Her weha hin bisporen Ewrûpî ji di civînan de besar bûn.

Her du hêzân li ser van xalêñ jérîn li hev kirin:

1-Divê ku hilbijartin di wexta xwe deango di Gulana 1995'an de çêbibe.

2-Divê ku tesîra partîyan ji ser hukmatê were kêm kirin û hukumet bête xurt kirin.

3-Divê ku Ordîya Kurdistanê ji nû ve were avakirin.

4-Di warê aborî û civakî de pêkanîna hin reforman.

Her weha herdu alîyan li ser siyaseta derva ji li hev kirin.

Civînê du name ji Neteweyen Yekgirtî re şandin; yek ji bo sistirîna ambargoyê li ser Kurdistanê, ya din ji daxwaza mayina Hêza Çakûc li Kurdistanê heta ku pirsa Kurdi li Iraqê bi rîyeke demokratik bête çareserkirin.

Bîbîyografyanîvisê Kurd Mistefa Nerîman mir



Mistefa Nerîman di 1925'an de li Kurdistanâ Iraqê ji dayik bûye. Ew ji şairî û nivîskartîya xwe bêtir bi bîbîyografyanîvisîna xwe bi nav û deng bû. Ev zanayê mezin ê Kurd di 28.5.1994'ân de wefat kir. Di hejmara pêş de emê bi dûr û dirêjî li ser jiyan û berhemê wî rawestin.

Xwedê wî bi rehma xwe şad bike.

Armanc

Rojeva Mehe

Mûrad Ciwan

Di 500 salan de çi guherî?

Di dema vî şerê dûmähîkê yê navbera PDK û YNK'ê de, pişti têkçûn û faşilbûna gellek muhaweleyên şerrawestandin û lihevanîn, ajansên derveyî welêt xeberek ragihandin ku Mesûd Barzanî ji Neteweyên Yekgirtî daxwaz kiriye ku ew bixwe nema dişen idareyeka yekgirtî li Kurdistanâ İraqê li ser piya bigrin û bimeşinîn, ji bo çareseri û selameta jiyana mileti divê Neteweyên Yekgirtî bixwe werin idarê bigrin desten xwe.

Ev xeber carekê di raporê hin ajansan re derbasbûn û careka din ji behsa wê nehate kirin. Mesûd Barzanî bi xwe ji tekrara daxwazek weha nekir û daxwazek weha li Kurdistanê pêk ji nehat. Loma ji nizanim çend rastiya nûçeyek weha hebû. Gelo Mesûd Barzanî daxwazek weha ji NY kiribû an na, heke kiribû ji di çi çerçewê de ev yek hatibû zimên. Ji xwe ji bo me Kurdan, bêpariya ji nûçe û agahdariyên rast û durust bûye qeder. Tu carî bi dilekî aram me neşiyaye em rastiya xwe bizanibin. Kî ci dibêje, belav dibe û, kî ci bêje bawer pê tê kirin û jê re dimîne.

Lê pişti ku ev xeber nehat tekzibkirin ihtimala mezin ku pareka rastiye di vê xeberê de heye. Ev, xebereka pir balkêş e. Li ber çavê hemû cîhanê itirafeke eşkera ya mezin e ku Kurd hê negîhiştine wê qonaxê ku karibin xwe idare bikin, qedera xwe bi destê xwe tayîn bikin. Muhtacî xerîban e, divê hinekên din werin wan idare bikin.

Divê bê zanîn ku gava ez li vê derê, behsa vê xeberê dikim qesda min ne ew e ku ez hin tiştan li ser Mesûd Barzanî binivîsim û rexnan li wî bigrim. Na, ez dixwazim balê bikşînim ser wî halê mileti xwe, wê rewşa mileti xwe ku Mesûd Barzanî anî noxta itirafek weha. Heke rewşekê ew neaniya vê noxta wî ev daxwaz nedikir. Peyveke gellek meşhûr heye ku dibêje "nedaye ma'bûd, ci bike Sultan Mehmed". Piştre piraniya me Kurdan bixwe ji ev daxwaza Barzanî maqûl dît. Çimkî hema hema me hemû Kurdan pişti ewende muhawelan hêviya xwe jê kiribû ku wê şerê birakuji yê berfireh raweste û Kurd lihev werin.

Ê min bixwe gava min ev xebera li ser daxwaza Mesûd Barzanî bihîst raste rast bîra min çû ser bûyera teqrîben 500 sal berê ku tarîx behsê dikin:

-Gava sedsala 16'an destpê bû hema hema temamiya Kurdistanê di bin hukmê Şah İsmail Sefewî yê hakimê Iranê de bû. Lê ji ber ku Mîrayefî û civakên Kurd ne şî'e, sunî û ji dîn û mezhebêndin bûn, idareya Iranê neheqiyek mezin li Mîrayetiyê Kurdistan dikir. Mîren Kurdistan dixwestin xwe ji bin hukumraniya Şah İsmail xelaskin. Di sala 1514'an de ev muhawele di serokatiya İdrîsî Bedlîsi de bi ser ket. İdrîsî Bedlîsi 25 emîren Kurd gîhandin hev û hemîyan bi yekdengî qebûl kîrin ku şerbîkin û xwe ji bin idara Şah İsmail xelas bikin. Di vî şerî de qebûl kîrin ku mutefikî herî nêzik û maqûl bi sunîtiya xwe û bi hêz û mezinayıya xwe Dewleta Osmanî ye. Di hemî tiştan de gihaştin hev lê di meseleyekê de li hev nedikirin û baweriya xwe bi hev nedianîn wê kî di nav wan de bibuya serok, begê began? Li hev çûn û hatin lê di neticê de di nav xwe de qebûl nekirin ku yek ji wan bibe begê began. Li ser vê yekê, ji bo ku bîryara şerî xelasîya ji bin nîrê Şah İsmail pûc nebe lihev kîrin ku nameyekê ji Sultan Selîm Osmanî re bişînin ku di vî şerî de seroketî ji wan re verêke, İdrîsî Bedlîsi li ser navê 25 emîren Kurdistan nameyek ji Yawuz Sultan Selîm re şiyand û her weha tê de daxwaz kir ku "ji ber ku heke ji wan kî bibe reis, yê din wê tehamûl nekin, teleba serdarekî ji alî dewleta alî ya Osmanî dikin" û di serokatiya wî de wê şerî Iraniyan bikin û wela-tîn xwe rizgar bikin.

Di wê demê de Kurdan û bi taybetî ji rîsîpiyê wan İdrîsî Bedlîsi ci dixwest Yawuz Sultan Selîm ew daxwaz qebûl dikirin. Lê bi baweriya min daxwaza ku Yawuz Sultan Selîm bi dilekî herî kîfxweş û şad bi cîh anîbe ev daxwaz e. Sultan Selîm, Biyikli Mehmet Paşa kir begê began û şand ser serî mîren Kurdistan. Ji wê rojê û pêve ev daxwaza Kurdistan bi vî awayî bû peymana navbera Kurdistan û Osmanîyan, bû qanûn li Kurdistanê: Kurdistan bi xwe itirafkirin û kîrin qanûn ku kes qebûl û tehamûl nake ku yek ji wan bibe serdar. Ji wê rojê pê ve herûher temsilciyekî dewleta super hat Kurdistanê bû begê began; yanî begê began ê ku bêgane bû.

Do İdrîsî Bedlîsi mecbûr ma ew daxwaz ji Sultanê Osmanî kir. Iro Mesûd Barzanî mecbûr dibe daxwazek wek ya binavkirî ji Neteweyên Yekgirtî dike.

Ez dikim bala xwe û difikirim ka gelo di van 500 salan de çi guheriye.

Ez dibînim ku dinya gellek hatiye guherîn. Çimkî do Dewleta alî ya Osmanî bû iro Neteweyên Yekgirtî ye. Lê di me Kurda de guherîneke berbiçav peyda nebûye. Do me daxwaza heyetek bêgane dikir.

Yanî hîn ji em bi xwe neşen qedera xwe bi destê xwe tayîn bikin.

15 salî û hejmara 150. ya Armancê pîroz be!

Endamê redaksiyonê Lewend Firat: “Ji Kurdan re televîzyon divê”

Kovara Stêrka Rizgarî bi endamê redaksiyonâ me Lewend Firat re hevpeyvînek çêkir. Bi munasebeta 15 salî û 150'î ya hejmara Armancê em vê hevpeyvînê di nav rûpelên Armancê de ji diweşinîn.

Redaksiyon

Stêrka Rizgarî: Ji kerema xwe re hûn dikarin Armancê û armancêne wê ji xwendevanen me re pêşkêş bikin?

Armancı: Armancı bi vê hejmara xwe ya 149'an ya meha Gulanê, ket 15 saliya jiyana xwe ya weşanê. Di Gulana 1979'an de Armancı wek şikiye kovarê bi Kurdi û Tirkî dest bi weşana xwe kir û heta hejmara 61'î bi wî hawî dom kir û wek organice nivresmi ya KIP û Pêşengê bû. Ev şeklê weşanê ji zarûriyeteke dihat lê ne tabîi bû. Ya tabîi ew bû ku Kurd bi ci zimanî diaxivin, pêwîst bû rojname ji bi wî zimanî derketa. Bi vê mantiqê ji hejmara 62'an û vir de Armancı him bi forma xwe û him ji bi naveroka xwe hat guherandin û seraner bi Kurdi (11 rûpel Kurmançî, rûpelek ji bi Dimilkî) derket. Heta nuha 149 hejmarên Armancı derketine. Iro bê pesin Armancı him bi naveroka xwe him bi uslûba xwe ya rojnamê di nav pressa Kurdi de pêşengiyê dike.

Herçiqas di destpêkê de armancı "Armancı" ew bû ku ew bibe wasiteya xwendin, nivîsandin û pêşxistina Kurdi lê iro ev qonaxê derbas kiriye, di warê zimanê Kurdî de gelek kadro afirandine. Iro di warê zimanê Kurdi de kesen ku xwediyê gotin in ew berhemîn Armancı ne. Wek M. Eli, Zinarê Xamo, S. Rêving, M. Lewendî, Hesen Mizgin û hwd. Armancı di warê rojnamegeriyê de ji karekî hêja kir. Di warê rojnamegeriyê de nivîsandina babetên nûçeyan (nûç, hevpeyvîn, reportaj, nivîsen nûçegihanê, komentar û hwd) pêş xist û di vî warî de bû tradisiyonek hêja.

Armancı di rûpelên xwe de ci da pirs û pirsgirekî siyasi, ci-vakî, dîrokî, çandî, edebî, yanî wek rojnameyea gelemerî ya siyasi, çandî û edebî derket. Ji aliye din rûpelên Armancı bi rûdan û bûyerên nuh, nûç û bûyerên li welêt û li derveyî welêt li ser Kurdistan qewimîn hatin xemîlandin.

Iro Armancı bi istiqrâr dijî, her ku diçe xurttir û gurtir dibe, xwendevanen wê pirtir dîbin û bawerî pê tûnîn. Tiraja wê di navbera 2500-3000'î de tê guherandin û ji mehî carekê dertî.

Redaksiyonâ Armancı ji van kesan pêk tê: M. Eli (Redaktör Berpirsiyar), Hesen Mizgin, Mîr-



Yen ku Armancı gihadine vê qonaxê bêguman xwendevanen wê ne

ze Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, Malmisanji (berpirsiyarê besê Dimilkî), Ahmed Huseynî (berpirsiyarê rûpelên edebî). Ev kes him ji alîkî ve ji bo debara xwe bikin kar dikin û ji aliye din ji bi dîlxwazî û berpirsiyariya ronakbîriya xwe ji bo Armancı kar dikin. Ku heta nuha Armancı gihişîye hejmara xwe ya 150. ev ji fedekarî û realistiya redaksiyonâ Armancı tê.

S. Rizgarî: Li bakurê Kurdistanê ji bo Kurd zimanê xwe bî axivin û binivîsinin divê ci bê kîrin, hûn di vî warî de ci difikiyîn?

Armancı: Dema ku em iro têde dijîn, dema teknik û komunikasyonê ye, ku Kurd ji wan bêpar bin wê ziman û kultura wan di nav elîtekê de bîmîne û pêş nekeve. Iro li Tirkîye û li Kurdistanê ji Kurdistan re radyo û televîzyon divê. Prosentez mezin yê gelê Kurd ji xwendin û nivîsandinê bê par in. Ku ev tişt nebe Kurd nikarin zimanê xwe biparêzin. Iro Kurd di qonaxeke wilo de dijîn ku ew ketine çerxa asîmilasyonê. Him televîzyonên dewletê û him ji yên şexsî di vê asîmilasyonê de rolek mezin dilizîn. Lê em Kurd ci dikin? Ne tenê kovarê ku em bi Kurdi derdixin herwisa kovarê bi zimanê Tirkî ku ji aliye Kurdistan ve tê derxistin ji nagîhêjin xwendevanen. Ew di bin zor û êrişen dewletê de ne.

Lê ji bo ku Kurdi û nav gel de neyê ji bir kirin û bi pêşkeve, pêwîst e serok û ronakbîren Kurdistan hewl bidin ku bi zimanê xwe bîxwînin û binivîsinin, di têkili û civînen xwe de Kurdi bikin zimanê.

Armancı: Belê hene. Lê kengî? Ev girêdayî hazırlîyeke baş, organizasyoneke hevdem û têknikeke modern e Yanî em naxwazin sê çar hejmar derkevin û dawî ji bê rawestandin...

S. Rizgarî: Projeyen we hene ku hûn Armancı li welêt derxin?

Armancı: Rojnama Kurdi ya mehane/Monthly Kurdish Magazine
Redaksiyon: M. Eli, Hesen Mizgin, Mîrza Bextiyar, Lewend Firat, S. Rêving, M. Lewendî, Berpirsiyarê besê Dimilkî: Malmisanji, Berpirsiyarê rûpelên edebî: Ahmed Huseynî, Utges av: Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen, Aboneti/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450 SKR, Li Ewrûpa: 60 DM. Li derveyî Ewrûpa: 50 \$, Anons/ilan: nîv rûpel/en halvsidan 2500 SKR, Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 50 37 99-9, Adres: Box: 152 16 161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Peymangeha Hunerên Ciwan-Dihok

Rêvebirê wê kek
Ebdulrehman Wehid Kelho

Hunermendêñ Kurd li Behdînan, hemû hêz, şîyan û heyîna xwe li Dihoka rengîn kom kirine û peymangehek (Enstitû) ji xwe re ava kirine.. Heval "Lîsa" yê jî destê alîkariyê dirêj kir. Ew keçeka Almanî ye û weke rojnamevan çûbû axa rizgarkirî li wê derê şehîd bû. Şehîdîn me nemir in. Ji lew ra pûta vê lehengê li ber dergehê peymangehê hatiye danîn...

Ev peymangeh ji sê pişkan hatiye çêkirin, şêwekarî, müzikî û şanoyî. Behra pirtir ji xwendevanê wê keç in. Li vê peymangehê kêmâsi gelek in û mixabine ku em Kurd li derveyî welêt xwedan li huner û heyîna xwe derneketin.

1- Beşa muzikî

Berpîrsyarê wê fîrkar Nihad Xalid dibêje: Xwendin li vê besê 5 sal in û şes fîrkar hene. Sê ji wan kemanjen in û bîst û yek xwendekar dersêñ kemanê dixwînin, çar kes piyanoyê dixwînin, sê kes okordiyonê dixwînin û du kes jî dersêñ ûdê dixwînin.

Li vê besê gelek kesan dixwestin ku xwe qeyd bikin, lê beşek hate pejîrandin. Bi rastî jêder kêm in û harîkarî nîne...

Kêmâsi gelek in weke: Pirtûkêñ li ser solfêc, koral, hanûn (hêzkirina tiliyan) lêxistinokêñ piyano û kemanê, têl û pêdiviyêñ kemanê, lingêñ notayê û hwd...

2- Beşa Şêwekarî (çêkirina wêneyan)

Berpîrsyarê wê fîrkar Ednan Şîno dibêje: xwendin li vê besê 5 sal in û me 9 fîrkar hene û 114 xwendekar lê dixwînin. 4 klas in, 90 xwendekar in, 24 xwendekar li kilasa yekê. 3 fîrkarê zimanê Kurdi, Ingilîzî û Erebî, fîrkarek bo saykoloji. Bi rastî materyal li nik me kêm in û peydabin.

Min se kevalêñ kilasa 2 ji çapêra



Tabloyeke Remziye Osman 31-3-1994

wergirtin. ev keval bi destê van xwendevanen hatine çêkirin:

- 1- Şilan Naïf
- 2- Remziye Osman
- 3- Dilêr Kamîran

3- Beşa Şanoyî-Sinemayî

Berpîrsyarê wê fîrkar Fehmî Selman dibêje: 9 xwendevan bo 2 qonaxan, her qonaxek dibe 2 ta, her tayek 10, xwendin jî 5 sal û sala siyê dibe 2 ta:

- 1- Zarvekirin

2- Derhênan

Xwendevan li vê besê van babeten dixwînin:

Dîroka şanoyî ya cîhanî û Kurdi, Hunera gotinê, hunera zarvekirinê, hunera derhênanê, hunera şêwekarî, felsefa hunerî, ronahî, mikyaj, dekor, cil û berg, dahênanâ bêdengî, werzişa şanoyî û hwd.

Niha xwendina sînemayî li peymangehê nîne. Ew jî ji ber nebûna kadîre taybetmend. Ta paşerojê !

Seîd Gabarî

Ev hevgirtin û bereya ku jêre li def û zîrnê xîstin ne tenê neçû serî, belê gavin bi paşde jî avetin... İca ev ci ye...?

Dema mirov piçekî mejîyê xwe bi kar bîne, wesa tê xuyakirin ku gelek partiyêñ Kurdan ji bo berjewendiyêñ xwe yên partiyetî û bi

wan nêrinê teng dîbin kelem û asteng di rîya rizgariya gel de, lê belê ev serok û rîber bera bizanibin ku baweriya gel di destê wan de wekî hevsar dê nemîne, iro be

yan jî sibê be, kesen ku ji bo armancêñ xwe yên pûc rî li xebata gel bigrin ew kes wê nemîne û gel madem ku navê wî gel e ewê riya xwe hilbijere û baweriya me bi gelê me roj bi roj xurtir dibe ku nema guhdariya def û zirna vala bike.

Helbesta min a bi navê HAWAR'ê diyariya min a yekê ye, ji bo ARMANC a delal û hemû xwendevanê hêja.

HAWAR

Hawar ji dest evê jînê ji êş û jan û birinê
Ji vê çerxa ku çep gerya ku dîsa tazî û şînê
Kirêt û sed hezar şerm e şehîd hê xwîna wî germ e
Serok û rîberen millet bi erzanî didin xwînê
Çi erzan bûye xwîna sor kefen û laş û term û gor
Serok û rîberen kula li sûkan xweş bi girine
Destpêkirin birakuji da ku tenê rîber bijî
Serokên din û bê mejjî welat kirme gola xwînê
Ev ci ye û ci rûdan e ev ci êş e û ci fixan e
Çiqas derd e û ci kovan e hawar ji jana birinê

Beşir Botani

NEYNIK

Ewtîna seyekî har

Felat Dilges

Ku riya we bi Enquerê ket, an ku hun di Enquerê re derbas bûn haya we ji we hebe, kuçikek har, seyek har li Enquerê heye. Ev kuçik ji serê çend salan de ye ku li Enquerê ye û her carê êrisi Kurdeki dike. Ev seyê harê bê kertik ê berdayî neyarê gelê Kurd e. Lî ev neyar ji gelek neyarê gelê Kurd dijwartir û hartir e. Bi xwîna mirov, memaze ji bi xwîna Kurdan diji. Ev seyê har, wekî gurên ku bi rojan birçî mane û ji birçîna tevâti nayê wan, di ciyê xwe de nalebite. Ev kuçikê har, ev beraze dijwar li ciyekî wusa rûdinê ku ne kes dikare xwe bigihînê û ne jî kes dikare ewtîna wî bide sekandin. Ji ewtîna wî, ji zûrîna wî, Kurden reben ên ku li Enquerê dijîn mane heyrî; lê tu kesî seyîn har nedîne bi vî tewrî.

Ev seyê har li Enquerê serdozgarê Dadgeha Ewlekarî ya Dewletê ye. Xwedênegiravî edaletê ew belav dike, li ser kaniya edaletê ya bi nav û deng a Tirk rûniştiye; misêwa edaletê belav dike; dewlet ji wî tê pirsin; notirvanê namûs û xîreta dewleta genî ye. Xwîniya wî xwîn, taştîya wî xwîn, firavîna wî xwîn, şîva wî xwîn; hebûna wî bi xwînî, jiyana wî bi xwînê ye. Bi xwînê diji, xwîn hebe heye; xwîn tunebe tune ye. Xurê wî, xwarina wî, vexwarina wî xwîna Kurd û Tirkêñ demokrat û mirov perwer e. Di gel ku ew bi piranî bi xwîna Kurdan diji, carna xwîna Tirkân ji vedixwe. Ne pêwîste ku mirov vî seyê har, vî kuçikê li ser mirar bi nav bike. Ew tê zanîn; ji xwe em Kurd wî baş nas dikin; herçiqas navê mirovan lê be jî, em baş dizanîn ku heywanek e, ew rewilek di şiklê mirova de ye.

Vî seyê harê ku qibla wî, niştimana wî Emrika ye, ji bo xwe kuçikêkî wekî xwe ji Emrika anî bû ku navê wî Golden Retriever bû. Em baş dizanîn ku seyê li Enquerê ye har bi xwîna Kurdan diji; lê belê Golden ci dixwar û bi ci dijiya em bi wî nizanîn: Ji ber ku Golden bi dermanê li ser çere cehimî bû, lê bi cehimîna wî, seyê har hartir û hovtir bûbû û edî êrisî hemû deran dikir. Seyê har ê li Enquerê, li ser cehimîna Golden helbesteke bi vî awayî dinivise:

Dîlan te feth kiribû

Seref hinî me kiribû..

Seyê harê ji şerefê bêpar xuya ye şerefa ku qal dike jî ji Golden hin kiriye. Lî bi cehimîna Golden, ne ferze ku mirov bibêje bêşeref maye. Ev kuçikê har pirr ber cehimîna Golden ketiye: Ewqas ber cehimîna Golden ketiye ku dibêje, "Ezê li ciyê ku Golden lê cehimî e peykerekê çêbikim û her sal, di salvegera cehimîna wî de kulfikan deynim ser" Ev kuçikê har bi tenê qîma xwe bi viyajî nayne, ew dixwaze ku roja 13 Nisanê roja ku Golden tê de cehimî ye her sal wekî roja parastina heywanen tebîtetê were îlankirin. Tu dibêji qey di kuçen Enquerê de seyîn beredayî tunin, tuleyên kuçan ên berdayî nemane !.. gelek normal e; lewra di tebîtetê de her heywan cinsî xwe diparêze; lê belê ev seyê me yê har ne ji dil e.

Me gotibû ku ev seyê meyê har li Enquerê serdozger e. Li ser cehimîna Golden, dema ku sehê me hartir dike û hişî wî ji serê wî dije, dest diavêje pirsa parlementerên DEP'î yên girtî û weha diewte, "Ma DEP'î jî kuçik in ku ez ji wan hes bikim." Ew seyê har rast dibêje, gelek rast diewte. Bi rastî tu seyekî din nikare bi vî awayî fesih û zelal biewte. Herweha ev ewtîna wî ji kezebê ye, ji dil e û ji can e. Ew bi vî ewtîna xwe dikare bibe dengbêj.

Gelek enteresan e; her civat xwedî hin taybeti ne. Herçî em Kurd in, taybetiyê me yên gelek balkêş hene. Di gel ku di dîrokê de cara yekemîn me heywan kedî kirine, me seyek kedî kirije; disa ji em ji seyan, ji kuçikan gelek acis in. Herê em heqê dilovaniya seyan didin wan; lê ew seyîn ku nanê me dixwin û li ber derê me naewtin, diçin li ber derê cîranê me an hinekêñ din diewtin jî qet efû nakin. Pê re dicehimînin, dikin dar û dihêlin ku qastin jî jê here. Yanî kuçik çiqas ji me re kuçiktiyê bike jî em jê hes nakin. Kuçikti bi me nexwêse e.

Herçî Tirk in(mirov dikare Kurden ku di pey de bûne Tirk jî têx vê kategorîyê) piraniya wan ne wekî me ne. Ew ji seyan hes dikin; heta faşîstên wan seyê rîber, pêşkiş û xelaskarê xwe dibînin. Nîşana alaya faşîstên Tirk, se ye. Xwedênegiravî wî seyî di derkenî Ergenekonê de ji wan re rîberî kiriye.

Baş e; wan şivanîn me yê Kurdistanê heta van salêñ dawî jî li ber keriyen pez çend seyan xwedî dikirin, ma gelo nizanibûn ku ew heqaretê li serok, rîber û bapîrêñ hinekan dikin?

Dirûvê Golden û wî yê seyê ku ji Tirkan re rîberiyê kiribû qet bi hevdû nedixist. Ma seyîn Amerika li kuderê ne, seyîn Asya Navîn! Her tiş li aliyeke, di rojnameyeke Tirkan de rîsmê seyê harê ku li Enquerê serdozger e û Golden li ba hevdû bûn; wisa dirûvê wan bi hevdû dixist ku, mirov dikaribû sond bixwara ku herdû cêwî ne. Nizanim gelo bala we kişand?

RAMANÊN RAMANWERAN

Mantiqê Dûz

Reşit BURHAN

Rojnameya "Armanc"ê bi siyaseta xwe ya weşanê ve, di warê demokrasiyê de îmtihaneke baş û qenc dide. Di nava rûpelên xwe de lênerînê cûda cûda diweşine û bi vê metodê îmkaneketekûz û fireh dide xwendevanan, da ku xwendevan bi xwe, bikaribin bîghêjin encamén van lênerînâ û ew bi xwe bîryarê bidin; bê gelo ma herdû lênerîn jî çewt in, yan jî kîjan wan rast e, kîjan wan çewt e. Ev helwesta Armancê dikare ji aliyê hemû kesan ve neyê pejirandin, lê her çi dibe, bila bibe, divê Armanc dev ji vê rîya xwe ya rast û pêwîst bernede û xizmeta xwe ya di vî warî de bi istiqar bidomîne.

Ez jî ji ber vê yekê dixwazim di nava sînorîn îmkanîn ku ji aliyê Armancê ve tê dayin de, vî mafî bi kar bînmû li ser nivisa S. Esmer (S.E) ya bi navê "Dost û Dijmin" dîtin û rexneyen xwe pêşkeshî xwendevanê Armancê bikim da ku xwendevanê Armancê bikaribe rexne û dîtinê min û tiştîn ku di wê nîvîsê de hatine iddiakirin, bîne ba hev û bi awayekî bîghêjin encamekê.

S. Esmer di vê nivisa xwe de diyar e, dixwaze ji xwendevanan re bîbe bê ka kî "Dost" û û kî ji "Dijmin" me Kurdan e. S.E. ji bo ronikirina dost û dijminen Kurdan, di destpêkê de li sosyalistên Kurd rexne digre. Xuyaye, S.E. bîyî ku li sosyalist rexne bigre, nikare, "dost û dijminan" bide naskirin...

Bê gûman sosyalizm -di ma'na olî de- ne baweriyeye pîroz e ku nikare bibe babetê rexneyan û tu kes nikaribe rexneyan lê bigre. Divê sosyalizm wek lênerînê, hertim bibe babetê rexneyan. Lênerîna ku deriyen xwe li rexneyan digre, îmkanîn xwenuhkirin û pêşdebirinê jî ji ortê radike. Lê hînek metodê rexneyan ji hene; rexne ne ew e ku hemâ ci bê ber devê mirov, yan ci bê bîra mirov, mirov bîbe, yan jî binivîsine. Divê mirov rexneyen xwe li ser faktâ û mantiqekî zanistî ava bike û çewtîti û armancê lênerînan, bi vî awayî diyar bike. Divê mirov di destpêkê de, lênerînan bi awayekî statik bistîne, wan dabeş bike, yanî analiza wan bike; beşen dabeşkîri bi hevdû ve girê bide û bigîhêje sentezekê û di encamê de teoriya wan derxîne holê. Di bingehê de, lênerîn mîna bûyeren din ne statik in, lê dinamik in. Statikwergirtina lênerînan, lêkolînê li ser wan, bi imkantir û hêsanter dike. Ev metod di analiza bûyeren civakî de, metodeke zanistî ye."

yalîst, ew ji me, ji xwendevanê Armancê re dibêje "Way sosyalizm tek çû!" Ji bo Kurdan jî bîyî ku wan kes an jî grûpênu ku dibêjin "em sosyalist in", ji hev cûda bike, dîsa işareteketekî wekheviyê dixe navberê û rexneyen bê faktâ û bi hînek fantaziyên xwe yîn bê bingeh ve, li Kurdistanê bê ma'netiya sosyalizm diyar dike. Bi rastî ez ji bo binavkirina metoda wî, li navekî xweşik û nerm geriyam, lê mixabin min di literarûra xwe de, navekî weha nedît û ez dizanim divê mirov ji bikaranîna hînek navêne ne xweş jî bireve, lê tev vê jî hînek kirâs li bejna vê nîvîsê û mirov nikare jê re fistanekî din peyde bike. Ji ber vê yekê, ez dibêjîm ku ev metoda S. E. dixebeitîne, metoda "mantîkê dûz" e.

1)- "İcar gava ku serokên welatîn sosyalist bîbe, em bi ser neketin û bijî serok Bush û em Kurd jî bîbe, Sosyalizm xurt dibe, bi rastî dûrî aqila ye". Ez li gora taqet û îmkanîn xwe siyaseta navneteweyî taqîp dikim û min tiştî wisa nexwendiye ku hî-

gotin û iddiayen Neo-liberalan, hemû Neo-liberalan girê nade, iddiayen hînek kesan jî hemû sosyalistîn girê nade. S.E. li vê ferqê nanere û dînîvîsine û dibêje "em Kurd jî bêjin sosyalizm xurt dibe." Gelo kî jan Kurd? Ger Kurde tîstekî bîbe, hemû Kurda girê nade. Ya din jî di nava Kurdistan de lênerînê cûda hene, dibe ku hînek tiştîn ne rast û beradayî bîbe, divê rexne li wan bi xwe bê girtin. Ma gunehê me Kurden din ci ye? Bila S. E. qet iddiayen wisa neke, bi hindikayî be jî hînek sosyalistên Kurd dizanîn ku di vê dema em tê de dijîn, sosyalizm xurt nabe, qels dibe. Ev bayê ji hêla baskê rast li dinya me zîz dibe û bi awayekî xurt tesîrê li hemû hêlîn jiyanê dike, bi xwe xuya dike ku lênerînê sosyalizm qels dibe. Lî bila ev neyê vê maneyê ku qelsbûn û yan jî xurtbûna lênerînê, çewtibûn yan jî rastbûna lênerînêne din diyar nake. Ji xwe pirr caran gelek kes, li gora xurtbûn û qelsbûnê bîryara xwe ya siyasi dide. Ji bo mirov li rastbûn û çewtibûna lênerînê

"Divê sosyalizm wek lênerînê, hertim bibe babetê rexneyan. Lênerîna ku deriyen xwe li rexneyan digre, îmkanîn xwenuhkirin û pêşdebirinê jî ji ortê radike. Lê hînek metodê rexneyan ji hene; rexne ne ew e ku hemâ ci bê ber devê mirov, yan ci bê bîra mirov, mirov bîbe, yan jî binivîsine. Divê mirov rexneyen xwe li ser faktâ û mantiqekî zanistî ava bike û çewtîti û armancê lênerînan, bi vî awayî diyar bike. Divê mirov di destpêkê de, lênerînan bi awayekî statik bistîne, wan dabeş bike, yanî analiza wan bike; beşen dabeşkîri bi hevdû ve girê bide û bigîhêje sentezekê û di encamê de teoriya wan derxîne holê. Di bingehê de, lênerîn mîna bûyeren din ne statik in, lê dinamik in. Statikwergirtina lênerînan, lêkolînê li ser wan, bi imkantir û hêsanter dike. Ev metod di analiza bûyeren civakî de, metodeke zanistî ye."

kan ji wan gotiye "Bijî serok nizanim kî" Lî ez şahid im ku pişti têkçûna sosyalizm hînek endamên buroyen Politik yê partîyen sosyalist yê wan welatan, nîvîsandin û di hevpeyvînen xwe de gotin ku "min qet tu carî, ji marksizm bawer nekiyî." Kî wê ji ci bawer bike, ev karê wan e, lê ger mirov li ser navê wê lênerîna ku mirov tu carî jê bawer nekiyî, siyasete bike, wê ci bîkariye bê serê wê lênerînê, diyar e. Gava min ev meqala hanê xwend, peyveke Lenîn ya ku di nava cilîn pirtûkên wî de nehatîne weşandin û di sindokan de hatiye veşartin, hat bîra min: "Hilweşandina sosyalizm wê bi desîn burjuwaziyen sor pêk bê" (Ev rist di nava rûpelên kovara "Obştestvo i Pravo" de hatiye weşandin.) Ev bi xwe, encamên burokîsiya di nava wan partîyen de jî diyar dike û diyar dike ku bê "burjuwaziyen sor" ci berhem derxist ortê. Ev nayê wê maneyê ku qet tu problemen lênerînê sosyalizm tune ye; heye û hem jî pirr in. Ev ne tişkî veşirîye. Dibe ku hînek kesan iddiayen wisa kiribin, lê ev idayen wisa hemû sosyalistên Kurd girê nade û nikare girê bide jî. Çawa hînek

bigere, divê mirov li ser problemen wê yê bingehîn raweste. Wek min li jor jî diyar kir, problemen sosyalizm yê bingehîn pirr in. Bo numûne: a)- Mulkiyet û awayê mulkiyetê b)- Têkiliyên kes û civakê. c)- Partî û dewlet. d)- Demokrasî û diktatorî. e)- Çin û têkiliyên wan. f)- Pêşketina navgînê hilberînê û siyaseta di vî warî de. g)- Siyaseta di warê tenduristî, perverdekirinê û çandê û hwd de...

Sosyalizm sistemeke lênerînê de derheqa van problemen de ye. Ew felsefeyeke di derheqa civatê de ye; ger mirov rexneyan li sosyalizm bigre, divê rexneyen mirov li van problemen û wek felsefeyeke sosyalizm bide ber xwe, lê erzanî heye, wek pêşyîn me dibêje" gava ga dikeve kîr dike." Bila kîrek jî ji S. E. be, lê lênerînê sosyalizm kîrê xurttir û tujtir diye.

Dîsa, dema min ev meqala xwend, çend gotinê hunermen-dekî İspanî hat bîra min: "Têkçûna sistema sosyalist, ne rastbûna sistema kapî-talizmê ye" Tersê wê jî rast e. Wendakirina sistema kapitalist ya di salê 1917, 1945 û hwd de, ne nîşana bê problembûna sos-

yalizm bû.

- Divê bersiva vê pirsê bê dayin: Divê sosyalistên Kurdan hebin ya na? Ger wê hebin, li himbera program û armancê wan yên di derheqa azadkirin û avakirina Kurdistanê de, program û arman-cen wî ci ne?

2)- S.E. dibêje ku "van cûdabûn û vejetandin roleke pozitif nelîstin, ji ber ku rîexistin ji hêz ketin û pirtir ber bi fikra cep cûn, ev yek nebû alîkarî ji bo afrandina politikayekê nuh û mantiqê guhertî." Bê gûman encama cûdabûna hereketen Kurde, bêta-qetiya hereketen me bû, lê cûdabûn bi tenê, ne sedema qelsiya hereketen me ye. Sedemên kûrtir û firehtir hene. Ger mirov li sedemên qelsiya hereketen me bigere, mirov dê li gelek sedemân rast bê. Gelo, S. E. ji bo ci, ne afîrandina siyaseteke pozitif, mîna sûc û gunehê çepbûna hereketen Kurda diyar dike? Li gora mantiqê S. E. ger cep tunebûna, wê siyaset li Kurdistanê nehatiba domkirin.

"Fikrek cep" tune ye, gelek fikren baskê cep hene, wisa gelek fikren baskê rast jî hene, lê ev di literatûra S.E. de tûne ye. Li ba wî "fikreke cep" heye, çewtîtiyên fikreke cep hemû hêzên cep girê dide. "Fikra cep iro li dînayê serê wê jebûye û li Kurdistanê jî piyê wê ne li ser erdê ye"(S.E.) Ev fikra bê serî li Îtalyayê wek blok dibe bloka duyem; li Macaristanê bi irada gel tê iqfidarê û hwd... Ev fikir, li welatîn cûda, bi rîya hilbijartînê tê iqfidarê. Rastbûn û çewtibûna wan dikare bibe babetê munaqeşeyê, lê "serê wê jê bûye" iddiayekê bê bingeh e. Xuyaye S.E. dîsa li merkezeke cep digere, çawa ku tenê merkezeke lênerînê baskê rast tuneye, lênerînê vî baskî hew ji merkezeke nayê idarekirin û gelek merkeze wê hene, wisa divê lênerînê baskê cep jî hew ne xwediyê merkezeke bi tenê bin. Her lênerînê cep, divê li gora şert û şirûdên xwe, serbixwe be, lê ev nayê wê maneyê ku wê di nava wan de alîkarî û piştigirî tunebe.

Dadgehên Tirka têna bîra min; dadgeran em bi komünîstiye suclar dikirin û digotin: "ev ramancen me yê sosyalist dibêjin "ramancen biyani." S. E. nabêje ramancen biyani, lê ji wan cudatir jî nînîvîsine. Gotina "Li Kurdistanê jî piyê wê ne li ser erdê ye." formeke xerab ya iddiayen "Fikrîn kok li derive" ye. Gelo çawa piyê me ne li ser erdê ye? Qey lênerînê cep ji axa Kurdistanê biyani ye û fikrîn cep li ser axa welatê me şin nabe, ji ber ku em ne li dînayê ne !

Em vê iddiayê muweqet qebûl bikin ku cep ji bo afrandina siyaseteke nuh, nebû alîkar. Ma gelo S. E. jî tu carî ji xwe pîrsîye bê ji bo ci baweriyeye baskê rast nikarîbû siyaseteke rast û tekûz biafirîne? Rast e, me çepan siyaseteke rast, tekûz û berdewam neafirand, gelek çewtîti û kêmâsiyê me çebûn; sedemên wan ne ji çepitiya me dihat, sedemên wan ji vê kûrtir e, lê S. E. li sedemên kûr nagere û vêya ji xwe re nake kar. Asanî heye, asanî, lê karê zanistayê ne asanî ye.

Di vî warî de mirov dikare binê hînek xalan işaret bike: a)- Bê-tecrûbetiye me ya siyasete. b)- Sewiyea kadroyan c)- Analfabîtzma li welatê me d) Êrişa dijimin ya li ser welatparêzan; her ji

çend salan carekê, bi şêweyekî xurt êris dihat ser kadroyan, hînek ji wan dihatin kuştin, hînek ji wan dihatin girtin û hînek ji wan jî ji welêt derdiketin. e) Astêngê ji ber şertîn xebata bi dizî f)- Rewşa civakî, çandî, perwerdeyê û hwd ya welatê me.

Lê ew lênerîna ku gunehê çewtîtiyên xwe têxin situyê çepitiyê, wê bi xwe jî negihêje tu devera. Ger em li Kurdistanê li dîroka hereketa welatparêz ya pişti salen 1970-yî bîniherin, em ê vê yekê bibînin: lênerînen baskê çepen Kurdistan, siyasetek ji ya lênerînen baskê rast, baştîr û tekûzir afîrandin. Pirranya kadroyen ku iro lênerînen baskê rast diparêzin, ji nav lênerînen çep tê. Lê ya xerab ev e ku hîn piranya wan, xwe jî literatûr û termînolojiya çep azad nekirine û ji ber vê yekê jî di warê paraztina lênerînen xwe yên baskê rast de, zehmetiyê dikişinin. Ev jî tu menfaetê nagîhîne me, xwediyen lênerînen çep.

3- S. E. weha dom dike; "Lê ez dibêjim sistema sosyalist iro têk çûye. Em wek Kurd divê giraniya xebata xwe bidin meselîn xwe yên millî, em dîsa hedefeke şaş nedîn ber xwe." Gava roj li ezmana be û herkes wê rojê bîbîne, yek bibêje: "Wa roj li ezmana ye", tiştîkî nuh nabêje. Ecêb ne ev e, ya ecêb ew e ku gava S. E. sosyalistbûn û xebata millî tîne hembera hevdû. Sosyalist li her deverê dînayê, li gora bîr û baweriyen xwe, ji bo pêşketina welat û gelê xwe, di nava siyasete de ne. Mirov dikare baweriyen wan çewt bîbîne, lê tu kes nikare bîbîje xebata ji bo serkevtina lênerînen sosyalizm, dikeve pê-şîya xebata "millî" û di vê rîye de astengian peyde dike. Sosyalist di rîya lênerînen xwe de, dixwazin welatê xwe baştîr ava bikin. Bê çawa hêzen baskê rast dixwazin li gora lênerînen xwe, welatê xwe baştîr ava bikin, sosyalist jî dixwazin li gora bîr û baweriyen xwe, civata xwe ber bi pêş ve biguherîn. Yen ku li dijî sosyalist e, bila karê xwe bîdo-mînîn, dikarin li hemberi wan bin, lê ger ew xebata millî û ya sosyalizm mîna du bûyeren ku li dijî hevdû ne, bidin nişandan, wê neheqiyê bikin. Gelo S. E. vê neheqiyê nake?

4- Ecêbên S. E. bi vê yekê bi tenê naqedin: Ka em bi hevdû re lê guhdar bikin: "Dijmin bi xwe jî dixwaze ku tevgera rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û tê de bifetise. Lî divê em xwe ji vê yekê xelas bikin, em berî her tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, pêşverû di welate xwe yê rizgarîxwaz di nav dînayek çep de be û wê di wê dînayê de bifetise. Ev tiştî we-latê xwe rizgar bikin, mûseseyen xwe yê netewî avabikin, xwen-degeh û instutiyen ava bikin ku lêkolîn li ser ziman, dîrok û kultura Kurdi bîkin. Em dikarin fikra xwe ya sosyalist, p

Çend peyv li ser bîranîna çarsed sa- liya Şerefnameyê û 75 saliya Hejar

Mumtaz Heyderî

Çend rastî:

Her çend gaziya rojnameya Biray- etî di ciyê xwe de ye, lê dereng hat. Çunkî di nav çend rojan de gerya- neke di nav cîhana pir dewlemed ya Hejarê mezin de pir zehmet e! Rojnameya Birayetî de çar babet dest-nîşankirine ku babetên din jî bi xwe re tînin. wek: Hejarê têkoşer û komara Mehabadê, Jiyana derbidefi û derve û nexwesi hwd.

Di wan babetên Birayetî de bi de- han babetên din yên ne serekî ji seri hildidin. Lî bi hûr nasandina babe- tan û tevaya jiyana wî ne karê hef- tiyekî yan dû heftiyan e! Bi taybetî di vê rewşa iro ya Kurdistanê de ji bo niviseke çak yan lêkolîneke weha ku mafê rewa yê bilîmet (dahî) û zêde mandibûyî; Hejarê mezin bi- deyê, zehmet e di maweyekî kurt de bête incam dan. Pirsa gaziya dereng dereceya ne şaristaniya me nîşan dide ku em zû bîra tiştan nabin!.

Çend rojgar û dijminen me, me bin dest dîkin divêt em bêtir û bi awayekî hûr û kûrtir li xwe bifikirin û li gor demen dîrokê mezinâhî ya netewa xwe ji her aliyejî jiyana wan ve bihilsenginîn û bi deme nuha û paşerojê ve girêbidin. Lewma pir pêwîst e em bi destê xwe xedre li xwe nekin û hwd!

Her wekî min gotî di demeke weha kêm de niviseke hêja durust nabe-eger bête kirin ji- ez bi xwe nikarim rî bidim xwe ku di çarçewa ya babeten rojnameya Birayetî de tiştekî weha binivîsim ku bi nîv go- tar ji bête nav kirin. Çunkî jiyana komelatî u siyasî û rewşenbirî ya Hejarê mezin bi xwe destaneke me- zin e û neteweyekî bindest û wela- tekî dagirkirî ye ku bi ci rengeki nabe li ser Hejar û berhemên wî bête nivîsandin bêyi ku li ser tirajidiya wi bê peyvin. Berhemên Hejarî serwe- teke hind mezin in ku ez ji ber wan xwe li hember Hejarî xwendevan- neki pir biçük dibinim. Ci ji destê min tê! Wê bo demeke din dihêlim.

Ya xuya ew e ku netewen pêşkefti yê cihanê di warê bîranîna bûyerên xwe yên girîng yan, mezinê xwe di ci warekî jyanê de be; dîrokî, ne- tewî, siyasî û rewşenbirî yan ji di bîranîna ji dayîkbûna mirovîn xwe yên mezin be, xwe pir zû amade di- kin, bi dehan komîteyên pispor yên serekî û neserekî ji pîrsê re durust dîkin, vêca ev pirseke seranseri we- latî digre. Her çende tevaya jiyana Kurdan bi awayekî gişî êş û azar û derbiderî ye, di himbêza wela- te xwe yê dagirkirî de, bê statûyeke netewî bûye, pê neçebûye hemû rîbâzân mileten pêşkefti yên dînyayê pey- rew bike -lê divêt weku erkekî nîşîmanî li gor deliveyan û hema ci nebe di hinek bîranînen mezin de, ku di astekî netewî de ne, ew cûre rîbâz û metod bêne peyrew kirin û binechî bibin. Vêca ez ji, li gor van axiftinîn xwe yên li jor, dê besdarî bîranîna sêyemîn ya koçkirina Heja- rî mezin bim. Herçende bîranîna salroja koçkirina her mirovîkî me- zin karekî pir pêwîst e û erkekî şaristanî û netewî ye, lê dikare her çend salan carekî be, bi awayekî nû ku kar û xebata wan mezinan ji ne- weyîn nû re bête nîşandan, lê digel vê ji ya pêwîstir ew e ku tîrêjê bêtir bixin ser roja ji dayîkbûnê, ew ji her çend sala carekî, wekû minak: 5 sa-

lan carekî, 10 salan carekî, 50 sa- lan carekî yan 75, yan 100 salan carekî. Bi kurtî divê li gor hêjayî û kar û xebata wî mirovî mezin be. Li wela- tê pêşkefti bîranîna weşandina berhemên mezin têni ki- rin, ew ji her bi wî şeweyî, sed yan dû sed saliya wan ... hwd.

Bê guman jiyan û berhemên Hejarê mezin bi gen-cîneyeke netewî û xwendingeheke dîrokî û rewşenbirî ya hevçerx tê li qelemdan, hêjayî hindê ye û erkekî nîşîmanî ye ku di hemû qonaxen xwendinê de bête xwendin. Aliyejî mezin yê jêhatî û pêçebûna Hejarê nemir, di warê zi- manî û wergerandinê de ye. Mînak ji bo vê ji kîlîta zêrin ya dîroka Kur- dan e, ew ji Şerefnameya pir buha ye. Di wergerandina wergerê mezin Hejarî de ruhê paqîj û zimanê zik- makî yê Şerefnameyê nemir hatiye ve jîyandin. Weha, zêdebarî ku Şerefname gencîneyeke dîrokî ye, bû gencîneyeke zimanzanîn jî, wer- bu ku her dû; Şerefname û Hejar bi hev û dû re hatine girêdan. Berî ku Hejarê mezin Şerefnameyê bike bi Kurdi, çavên piraniya netewê me bi dîtina wê ya pîroz nehatibûn kil- dan. Her çende, li vê derê, neku her dû wergerren erebî divêt bes li bîra me bin, lê di cihê xwe de ye bi rîz- darî û buhadarî bêne destnîşan- kirin. Bi her halekî be ez li ber tîrêja axiftinîn xwe pêşniyar dîkin ku em her ji nuha, bîr bibin, xwe bi awayekî zanîstî û di astê netewî de û bi rengekî berfireh bo bîranîna çar- sed saliya şahgula kitêba Kurdan (1596-1996) Şerefnameyê û bîranîna salroja 75. a jidayîkbûna wî ronakbîrî netewperwer yê me- zin yê Kurdistanê, Hejarê Kurdan, amadebikin. Bi rastî, eger ez jîbo xuyakirina bîr û dîtinîn xwe li ser pêşniyarîye bi çend peyvîn baş qala dîrokî û mezintîya Şerefnameyê bikim, dê hind bêjîm wergerandina wê bo zimanen din yên cîhanê û pêşgotinîn ku jê re hatine nivîsandin bes in!!

Digel mezinî û kûriya jiyan û hesta netewperwerî û dereceya bi- lind ya rewşenbirî û mamosteşîya ziman zanînê û tûjiya qelema resen ya Hejarî (neku bi lêkolîneke za- nîstî) lê bes bi hejmartina berhemên wî û pêşgotinîn jê re nivîsandine, em dizanî ev mirove ci qas mezin e. Divêt em li gor mezintîya Şerefnameya Şerefnameyê Bedlîsi û jiyan û hesta pak ya Hejarê qele- hesin (weku xencerâ ji hesinî) û pîrşingdar ber bi wan her dû bîranînen pir mezin gavan bavêjin, riya dijwar ya xebata yekemîn pêşmergeyê qelema Kurdan, Şerefnameyê Bedlîsi û heta digehe sala 1996'an, nizanîm dê çawa beji bona serfiraziya Kurdistaneke şaristan û serbixwe de bidim xwuyakirin.

Têbinî:

-Di pirsa 400 saliya (1596-1996) de serekânî, wergera mamos- ta mele Cemîl Rojbeyanî û Hejarê Mukriyanî ye.

-Ji bo sala ji dayîkbûna Hejarî, dû sal hatine destnîşankirin (1920-1921), lê min pîrsyar ji birayê xwe yê hêja kak Firenso Herîri kir, ewî got: Di 6'ê Sha'ban 1339'ê Hicri de ji dayîk bûye. Mamosa Kerîm Şarezayî ji xiste berêk û got ku li gor tarixa Mîladi, roja jidayîkbûna Hejarî dibe roja Pêncsemî 15.04.1921 Sipas bo herdûwan.

NASNAMEYA MÊRXASEKİ: MUHSÎN MELIK

Zinar Soran

Di vê qonaxa ku iro tevgera Kurdistanê tê de derbas dibe, di nava gelê Kurd û dewleta kolonyalist ya Tirk de, di gelek waran de şerekî dijwar û pir ali dom dike. Dijminê kolonyalist bi barbariyek mezin êrisi ser gelê Kurdistanê dike. Hê- zîn dewletê yêneşkere û tarî hemû metodên hov û terorist bi kar tînin. Gund û bajarê Kurdistanê dişewitînin. Mirovîn sîvîl qetil dîkin û bi darê zorê wan ji cîwârên wan koçkirin didin. Sirgûn, girtin, işkence û qetilkirina mirovîn sîvîl jî, êdî bûye perçakî jiyana rojane ya gelê kurd. Roj tune- ye ku di vî şerî hov û gemarî de çend siyasetdar, rewşenbir û welatparêzên kurd ji aliyê hêzîn dewleta tirk ve neyên kuştin. Dewlet van kirya- ren xwe yên terorist bi navê "Bû- yerên Qesas nenas" bi nav di- ke. Lî di rastiya xwe de, bûyer eşekere ne û qesas jî dewleta tirk bi xwe ye. Hêzîn dewletê bi awakî sistematik û pro- gramkirî pêşeng, siyasetdar, rewşenbir û welatparêzên kur- dan dineqînîn û wan ji holê rad- dîkin. Bê guman, ev ne bê se- dem in. Dijmin baş dizane ku pêşeng, siyasetdar û rewşen- bîrên kurdan stûnên civata kurdîne. Kevirê qoziyîn ava- yiya civatê ne. Ew lîstik, fen û planen dijmin ji nêzik ve na- dîkin; kirya- ren dewletê yên hov û terorist, dirûti û rûreşîya dijmin deşifre dîkin; hay û bala gelê Kurdistanê dikşîne ser van kirya û bûyeran. Ji ber van hoy û sedeman ne ku dewleta tirk bi taybetî nêçîra mirovîn weha dike. Dijmin baş dizane ku civateke bê pêşeng, siyasetvan û rewşenbir bi awakî hêşantir dikare di bin destan de bê hiştin; dîl û esîr bê girtin.

Şehîdkirina hevalê hêja Muhsîn Melik ji, di esasî xwe de perçakî vê plan û polîtîkaya dewleta tirk e. Muhsîn Melik yet ji wan siyasetdar, têkoşer û welatparêzên kurd bû ku plan û lîstikên dewletê bas- dînîbûn. Heta ji dest dihat, wî bi rî û metodên cihê kirya û lîstikên dewletê eşkere û rûreş dikir. Ji ber vê yekê jî, dijmin ew li pêşîya armanc û planen xwe asteng û kelemekî mezin didit.

Muhsîn Melik di 1951'ê de li bajarê Rihayê tê Dînyê. Ew dibistana pêşî, navîn û lîse li Rihayê dixwîne. Di 1971'ê de, li Edenê dest bi universiteya Zîraetê dike û di 1976'an de dibe muhendisê Zîraetê.

Muhsîn Melik hîn di dema- xendevaniya xwe de besdarî nava tevgera nişîmanperwerî dibe. Gava Muhsîn li Edenê di unîversiteya Zîraetê de dix- wand têkiliyê wî bi hevalben- dîn "Partiya Demokrat ya Kurdistana Tîriyê" (PDKT) re çedîbe û pişî demekî dibe endamê PDKT. Heval Muhsîn Melik di rîexistiniya Edenê û Rihayê ya PDKT de gelek xeb-

atên hêja û berbiçav dike. Di sala 1975-an de besdarî Kongreyâ PDKT dibe û weke endamê Komîteya Navendî tê hilbijartin. Di vê Kongreyê de, Muhsîn Melik yet ji wan nûneran bû ku ji bo pêşketin û nûjentiya PDKT hewl dida û dixebeitî. Ew hevalbendekî xeta pêşverû û radikal bû.

Piştî xwendina xwe ya bilind, Muhsîn li Rihayê cîwar dibe û dest bi muhendisiyê dike. Heval Muhsîn hergav ji xebat û têkoşîna hevbes û rîexistiniyê bawer dikir. Ji bona ku bika- rîbe kiryar û planen dewleta kolonyalist deşifre bike, pey- wendiyen xwe yên bi xelkê re xurtir û berfirehtir bike, di de- rheqê lîstik, plan û kirya- ren dewletê de gelê xwe bêtir hay- dar bike, di damezirandin û bîr- rîvebirina gelek komele, avayî û rîexistinîn demokratik, mes- lekî, kültür û siyâsî de cih di- gre û di nava wan de bi awakî aktif dixebeitî. Ji ber van xeba- têne jî, ew çend caran tê girtin û sirgûnî bajare Çankirê dibe. Piştî demekî ew istifa dike û disa vedigere Rihayê.

Di dema ku 7 parlamenteñ kurd ji bo ku besdarî Konferansa Parisê bûbûn, ji SHPê tê avêtin, Muhsîn Melik û hevalen wî li hemberî vê kirya- re jî bêdeng namînî û bi awakî tundî û bi dengekî bilind vê kirya- re protesto dîkin; li gelek bajarê Kurdistanê bi awakî gişî û hev- bes ji rîexistinîn SHPê istifa di- kin.

Musîn Melik yet ji wan ke- sen ku di damezirandinâ HEPê de cih girtibû. Di Kongreya HEPê de li ser "Kemalizm" axaftinekî dike û di wê axaftina xwe de diyar dike ku "divê Kemalizm di mahkemeyek nav- neteweyî de bê mahkeme ki- rin". Ji ber wê axaftinê ew disa tê kirtin û çend mehan di zîndana Diyarbekirê de radîzê. Di Hilbijartina Giştî ya 1991'ê de, ku SHP û DEPê hev- kariya hilbijartînê çêkîribûn, Muhsîn Melik di lîsteya Rihayê, rîza pêşî de tê nîşan dan. Ew wê demê hîn di girtîgehê de ye û berî hilbijartînê bi çend ro- jan tê berdan. Muhsîn di wê hilbijartina ku gelek şik û şuphe li ser hebûn, bi çend dengan nayê hilbijartîn.

Piştî girtina HEPê, Muhsîn Melik di damezirandinâ DEPê de jî weke endamekî daner cih di- gre û dike serokê liqî Rihayê. Di Hilbijartînê Meheli yê 27-ê adara 1994-an de, ji bo serok- ê Belediya Rihayê, tê nîşan dan. Lî ji ber ku DEP xwe ji hilbijartînâ vedikşîne, Muhsîn ji besdarî wê hilbijartînabe.

Gava ji aliyê "Dadgeha Za- gona Bingî" (Anayasa Mah- kemesi) girtina DEP'ê dikeve rojevê û niyeta Dadgeha Eşkere dibe; hewildana damezirandinâ HADEP'ê dest pê dike. Muhsîn Melik disa weke endamekî daner di nava vê xebatê de cih di- gre û dikeve Meclîsa HADEP'ê.

Muhsîn Melik mirovîkî nef- biçük bû. Bi dû payê û karyerê nedireviya. Bê ku navê xwe derxîne pêş ci xebat û vatiniyê

biketana ser milen wî, bi cih dianî. Pirs û pirsgirêkîn civata kurd ji nêzik ve taqîb dikir. Derdora wî û xelkê gelekî jê hez dikir. Di têkiliyê xwe de teng nedifikirî. Heta ji dest dihat, wî dixwest bi gelek beşê civata kurdî re peywendiyen xwe germ bihêle. Wî bi hêsanî dikaribû xwe bigîhanda derdrek fireh; ew weke "platfor- mek peywendiyan" dihate dîtin. Ji ber van taybetiyen wî, ne hew derdora wî ya nêzik, herweha girsekî mezin yê civata kurdî jî, ji Muhsîn Melik pir hez dikirin û giraniyek taybeti didanê.

Ew xebat û têkoşîna heval Musîn û ew taybetiyen wî, ji aliyê dijmin ji hatibû keşif kîrin. Dijmin ew ji nêzik ve xis- titibû bin çavan. Êdî ew hedefek berbiçav ya dewleta kolonyalist bû.

Muhsîn Melik di zanebûna vê tehlîkî de bû. Hêzîn dewletê çend caran xwestibûn wî bi- revînîn û bikujin. Lî di wan he- wildanen xwe de bi ser neke- titibû. Teva vî tiştî jî, Muhsîn Melik nedixwest ji navçeya xwe û ji gelê xwe dûr bikeve.

Di 2'ê Heziran 1994'an de, li Rihayê disa hêzîn dewletê li pêşîya Muhsîn Melik kemînek bêbexî danibûn. Mixabin vê carê têkoşerê hêja Muhsîn Melik û şofîrê wî Mehmet Ay- yıldız ji kemîna dijmin xelas nabûn û bi gulen dijmin kolonyalist hatin şehîd kîrin. Heval Muhsîn Melik mirovîkî aştîxwaz bû; lê mîrxasekî demokrat û bê tawîz bû; siya- setvanekî zane û piralî bû; doz- darekî tevgera nişîmanperwerî ya kurdî bû; Evîndarê xebata rîexistinî û hevbes bû. Heta roja hate şehîd kîrin ji, wî ji bo van bîr û baweriyen xwe xebat û têkoşîna xwe bi mîrxasî da do- mandin û di vê riya pîroz de, gihaşt paye û mertebaya herî bi- lind.

Em baş dizanîn ku Muhsîn Melik ne şehîd yekem û wê ne yê dawî be. Gelê kurd wê di xebat û têkoşîna rizgarîxawzî û azadiyê de hîn gelek şehîden din bide. Lî, di vî warî de vatiniyek gelek girîng û berpirsiyatiyek dîrokî dikeve ser milen rîexistinî me yên siyâsî, komele û avayîyen me yên demokratik û hemû nişîmanperwer û pêşverûyên Kurdistanê. Divê em ji bi hev re, bi awakî sistematik û programkirî, li hemberî van êrîşen dewletê yên sis- tematik, plankirî, hov û terorist rawestin; bi hemû hêz, imkan û metodên xwe yên pêwîst pêşeng, siyasetdar û rewşen- bîrên xwe bêtir biparêzin. Di vî warî de, gelê xwe bêtir per- werde û haydar bikin. Bici- hanîna vatiniyên weha girîng, ancax bi alîkarî û piştgiriye berfireh ya gel û bi xebat û têkoşînek piralî ya rîexistinî û hevbes mumkun e.

Muhsîn Melik û hemû şehîdîn Kurdistanê di tevgera rizgarîxawzî û azadiya Kurdistanê de û di dilê gelê kurd de dijîn.

Yûsifê Hecî Hersan

kalemêrê ji hevalan mayî

Konê Reş

Amûdê yek ji kevnirin bajarê herêma Cezirê ye. Amûdê dikeve nêzîkî tixûbên Tirkîyê. Ji bakur ve Çiyayê Mêrdinê bi ser de xûz dibe. Ji başûr, rojhilat û rojava ve deşta Mêrdinê ji hawirdora wê ve, fireh û dirêj dibe. Mirovê ku buharê li bajarê Amûdê mêze bike ji jor de, wê Amûdê jê ve xuya bike, wek gemiyeke rawestiyayî di peravê deryayeke şin de.

Di nav kurdan de û bi taybeti di nav kurdên Sûriyê de, navê bajarê Amûdê cihekî bilind û giran digire û ci dema ku navê Amûdê tê ser ziman, pêre ji "Toşa Amûdê" û "Agirê Sinema Amûdê" tê bîra mirov û her weha "Amûda Bavê Mihemed" ... Carna ji tê gotin "Amûdê paytext e" ango paytexta Kurdên Sûriyê ye. Ji şoreşa Şêx Seîdê Piran: 1925 û vir de, gelek welatparêzên kurdan xwe li bajarê Amûdê girtin.

Çend kes ji wan welatparêzên naskirî ev in:

Qedrî Can, Reşîdê Kurd, Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar), Tirêj, Cigerxwîn, Osman Sebrî, Evdê Têlo, Mele Evdilhadî, Mihemed Eliyê Şewêş, Kurê Herson û weha bi dehan ji şêx û melan û axayên kurdan yên welatparêz û niştimanperwer.

Di wan salên ku kovar û rojnameyên Bedirxaniyan wek: **Hawar, Roja Nû, Stêr û Ronahî** li Şamê û Beyrûtê çapdibûn û ji xelkê Amûdê re dihatin. Hingê ev kovar û rojname bi rêka Yûsifê Hecî Hersan û **Mele Evdilhadî** di nav xelkên Amûdê de belav dibûn û Yûsifê Hecî Hersan ji Evdilhadî bêtir berpirsiyari hildabû ser milin xwe û gelek caran ji bo anîna wan diçû Şamê û Beyrûdê.

Îro li bajarê Amûdê ji wî nifşê pêşin Yûsifê Hecî Hersan tenê maye û destê wî ji dîtin, ger û rûniştina kolan û çayxaneyên Amûdê nabe, teví ku piraniya zarokên wî li Ewrûpa dijin û dixwazin wî ji bibin Ewrûpayê lê; ew dibêje:

-Kuro ez rûniştineke civatên Amûdê nadim bi sed Swêd û Awrûpayê!

Li Cezirê tu kes tuneye ku Yusifê Hecî Hersan nasneke. Kesê birewer di amûdê de tuneye ku "Bavê Dara"; Yusifê Hecî Hersan nasneke. Ev kalemêrê ku her roj li çayxaneyên Amûdê xuya dike û li dora wi birek ji kalemêr û xortan kom bûne, ew ji ji wan re bîranin û serpêhatiyên xwe dibêje. Hem ji li ser dema berpirsiyariya xwe ya belavkirina kovar û rojnameyên Bedirxaniyan qise dike û dibêje:

-Welleh yabo, filanches duqat heqê kovaran didan, lê filan û bêvan ta ku heqqê wan didan çavê min dirijandin.

Li vir ez dixwazim xwendevanê rojnameya Armancê seh kin da ku Yusifê Hecî Hersan, ev kalemêrê dîrokî ci dibêje.

-Bavê Dara ji kerema xwe re xwe bi xwendevan bide naskirin?

-Ez Ûsê Hecî Hersan, "Bavê Dara" me. Emrê min li dor 75 salan e. Ez li gundê Sêmitik ji dayik bûme. Em li Sêmitik û dû re ji li Gîsorê cotkarî bûn, me pez û dewar bi xwedî dikirin. Pişti "Toşa Amûdê", 1937 ez hatim Amûdê ba birayê xwe yê mezin Hecî İbrahim. Û ji wê wextê heta nuha ez li Amûdê me.

-Tu li Amûdê çawa ketî nav refen welatparêzên Kurdan?

-Pişti ku ez hatim Amûdê, rastî hin kesan hatim, ji min re qala kurdîtiyê, zimanê Kurdî û Kurdistanê kiran. Hîngê kîfa min ji gotinê wan re hat û min têkilî bi wan re danî. Ji wan kesan yên ku navên wan tê bîra min; Mele Hesenê Kurd (Hesen Hişyar), li ber destê wî ez fêrî xwendin û nivîsina Kurdî bûm. Reşîdê Kurd, Mehemed Eliyê Şewêş, Evdê Têlo, Ezîzê Darî, Cigerxwîn (Wê demê Cigerxwîn melê gundekî nêzîkî Amûdê bû, lê pirê caran li Amûdê bû). Wê wextê gelek ca-

-Armanc û daxwazên Nadî Kurdistan ci bûn?

-Armanca me xwendin û zanîn



Yusifê Hecî Hersan
di xortanîa xwe de, 1947

bû, armanca me serxwebûna Kurdistanê bû, Kurdistanâ mezin û yekgirti. Erê nadîya me kultûrî bû, gelek ji Ereban ji di nav me de fêrî zimanê Kurdî dibûn, lê bingeha nadîya me sîyasi bû. Ala me ya Kurdî hebû. Firqa kişafa (?) hebû, serokê wê Ezîzê Darî bû.

Ji alî şêx, melle û sofîyan ve û carna ji ji alî hin axayan ve şerî me dihat kirin. Ji yên ku gelekî bi me re bûn û pişta me di girtin; **Mala Xelo, Mala Haco, Melle Şehmo, Mihemedê Hecî Evdê bûn.** Û carna ji Şêx Ahmedê Xiznewî alîkarîya me dikir.

-Li pêşîya belavkirina rojname û kovarên Kurdî ci problem hebûn. Ji ber ci sedeman kovarên Bedirxaniyan hatin rawestandin?

-Dema ku rehmetiyê Mîr Celadet û Kamûran Bedirxan kovar û rojnameyên xwe dişandin Cizirê hingê yên ku ew kovar û rojname li Amûdê belavkirin ez bûm, li cihê din wek Qamişlo, Tirbesipî û Hesekiyê ji **Mele Eliyê Topiz** bû. Mele Eliji min bêtir difirotin û perê wan ji distandin. Lî yê min ta ku min 5 lire ji hinan distan çavê min dirijandin. Ji ber weka yekî gawir li min dinêrîn. Wê

demê hin ji şêx, melle û sofîyan şerî me dikirin. Ü dijmin ji ew dehf didan. Millet ji nezan û cahil bû. Vêca ji me re dijgin "Hün gawir in, qetla we helal e!" Ji rexekî din ve ji piraniya şêxên Amûdê xwe dikirin Ereb, nedîhîştin zarak herin cihê férbûna zimanê Kurdî. Û yên ku pantolon li wan ba, dijgin

ran Qedrî Can, Hemze Resûl, Medenî Resûl, Reşîd Celho û Reşîd Xelîl ji dihatin Amûdê. Ev kes Kurdên Şamê bûn û li Cezirê mamosteyî dikirin. Wê wextê Nadî Kurdistan (Klûba Kurdistanê) li Şamê hebû. Ev Nadî di bin serokâriya İsmet Şerîf Wanlı de bû. Vêca bi alîkarîya wan Kurdên Şamê me şaxeke vê Nadîyê di 1939'an de li Amûdê ji vekir. Hingê serokê vê Nadîyê li Amûdê Mihemed Eliyê Şewêş bû. Bidestpêka şerî cihanê yê dwemîn re, ev Nadî ji alî Fransizan hat girtin. Her çendî Mala Haco Axa û Cigerxwîn li Hesekiyê çûn ba mustesarê Fransî, lê dîsa ji feyde nekir. Nadîya me hat girtin. Wê demê Nadîyê Ermenî û Suryaniyan ji hebûn, tev hatin girtin. Hîngê me şaxeke Xoybûnê bi rengekî veşartî li Amûdê vekir û ji nû ve me di Xoybûnê de bi awakî dizi kar kir.

-Armanc û daxwazên Nadî Kurdistan ci bûn?

-Armanca me xwendin û zanîn

"sahidiya wan qebûl nabe". Ma çawa emê pêşde biçûna û cihê lingê xwe di erdê de çekira û çawa millet dê kovar û rojnameyên Kurdî bi pereyan bikiriyana! Ji bilî van alozîyên ku di nav me Kurdan de hebûn, pişti çûyina Fransizan, hukumetên Erebî yên ku li Sûriyê û Lubnanê hatin damezrandin rê nedan Kurdan û xwestin ku Kurdan di nav xwe de wenda bikin. Ev ji sebeke mezin bû ji bo rawestandina van kovaran.

-Pişti çûyina Fransizan û damezrandina hukumeta Erebî ya Sûriyê, rewşa we çawa bû û we ci dikir?

-Ez benî wê hingê piranîya me bûn komünîst. Ji ber ku komünîstan ji me re xweş dikir û dijgin "millet tev birayê hev in, wek hev in, divê dibistanê her milletekî bi zimanê wî bin". Û tişîn weha... Lî di 1949'an de Hisnî Ze'îm ku meyildarê Tirkan bû, inqilabek çêkir, hukmê Sûriyê ket bin destê wî. Wê hingê Husnî Ze'îm xwest ku Kurden Şamê herin konsolosxana Tirko û ji wan re bibêjin ku ewê li dijî Tirkîyê tu karî nekin. An na gerek ji Şamê derketana. Anglo Husnî Ze'îm zor li wan kir ku herin. Yên ku ji wan hat xwestin ku herin konsolosxanê; Mîr Celadet Bedirxan. Qedrî Cemîl Paşa, Dr. Nûrî Dêrsimî, Dr. Ahmed Nafîz û yên din. Îcar ji mecbûri Mîr Celadet û Qedrî Cemîl Paşa çûn konsolosxana Tirkan. Di wê çûyinê de Mîr Celadet fîncana qahweya xwe bi ya konsolê tirkan guhert, ji ber ku bawerî bi konsul nedianî. Wê demê, teví ku em komünîst bûn û me di nav Partîya Komünîst a Sûriyê de kar dikir ji, komünîstên Sûriyê ji me nerazî bûn û ji me re dijgin "hun neteweperest in û doza we Kurdistan e". Vêca dema ku me seh kir ku ev kes çûne konsolosxaneya Tirkan, em gelekî aciz bûn û me li mala min beyanek nivîsand, hingê ez û Reşîdê Kurd bûn, lê haya Osman Sebrî û Qedrî Can ji ji beyanê hebû. Me di beyana xwe de nerazîbûna xwe ya ji çûna wan a bo konsolosxanê dabû xuyakirin. Pişti ku beyan belav

bû, ez û Reşîdê Kurd hatin girtin. Osman Sebrî û kurê wî Welato, Hesen Dêrikî û Qedrî Can li Şamê hatin girtin. Em çend heyv di zîndana Qela Şamê de man. Paşê em surgûnî bajarê Tedmûrê kirin. Wê hingê inqilab li ser Husnî Ze'îm çêbû û em ji hatin berdan. Û me dev ji Partîya Komünîst berda, heryekî ji me li mala xwe kar kir. Osman Sebrî li Mîrayê bû memûr. Min ji li Amûdê di klînika Dr. Nafîz de dest bi kar kir. Di 1952'an de Osman Sebrî mala bar kir çû Şamê. Qedrî Can û Reşîdê Kurd ji çûn Beyrûdê. Û weha her yek bi karê xwe de ketin heta salên 1956-57'an. Di wê tarîx de Osman Sebrî û Nûreddîn Zaza û hin kesen din bi hev re li Sûriyê Partîya Demokrat a Kurdistanê ava kirin.

-Ji hevalen te yên wê demê kî mane?

-Ji wan hevalan Biroyê Hecî Isoyê Qiço maye. Di 1944'an de dema ku Mîr Celadet, Roger Lescot û Pierre Rondot hatin Amûdê, hingê Qedrî Can mudîrê Dibistana Amûdê bû û Biroyê Hecî Iso ji şagirtekî jîr û zîrek bû. Vêca Qedrî Can hişt ku Biroyê Hecî Isoyê Qiço gotina "xêrhatin" a wan bixwîne.

Nuha ez û Biroyê Qiço piranîya çax û demen xwe bi hev re dibûrinin. Yên din hinek ji wan mirine, yên mayî ji ne li Amûdê ne.


-Çima tu weha bi Amûdê ve hatîyi girêdan, destê jê nabe?

-Ji ber ku bajarê min e û min piranîya umrê xwe lê buhurandîye. Hevalê min giş ji vir bûn, an ji li vir bûn, piranîya wan li vir mirine. Her weha Amûdê cihê serpêhatî û bîranînê min e, şopa heval û hogirê min li vir li ber çavê min e. Ez ji dixwazim li Amûdê bêm veşartin. Ez vê ji dixwazim bibêjim ku hûn zanibin navê Amûdê yên herî kevn Amêdiya ye.

-Tîştekî din ku tu bibêji?

-Ma ezê ci yê din bibêjim. Hema li zimanê xwe miqate bin û ji bîr nekin bes e. Heke we zimanê xwe ji bîr kir we xwe wenda kir!

Amûdê, 7 Hezîran 1994



Ji destê çepê berbi rastê: Yusifê Hecî Hersan (li alî çepê, bi simêl) li gel endamên Nadî Kurdistan a Şamê, Reşîd Celho, Melle İbrahim û Seyfeddin Isa. 1942, Şam

XELÎLÊ ÇÂÇAN

Berrojka zivistanê û hîva şevêñ reş bû



Radyo di sala 1967'an de kete mala me. Min bi xerciya xwe û ji bayê xwe bi dizî kirribû. Wê demê digotin radyo işe şeytên e. Her êvar min di oda xwe de guhdariya radyoya Yêrivanê dîkir. Èvarekê cîardin min guh dida radyoyê, ji nişka ve bayê min derî vekir û ket hundur. Ez qutifim. Ez difikirîm ku bayê min vê radyoyê bibîne, wê bişkîne. Bayê min çav li radyoyê ket, demeke kurt sekîn û guh da sitrana Kurdî. Xwe da ser kursiyê û got: "Kuro ev ci iş e, va radyoya te bi Kurmancî dibêje. Hebki dengê wê bilind bike, ez baş nabîhîsim". Bi kîfeke xweş min dengê radyoyê bilind kir û me bi hevre guhdarî li kilama xweş kir. Dû re bayê min ji min pirsî got: "Van sitranan ki dibêje û ki amade dike?" Min got ku radyo li welatê Ermenîstanê, li bajarê Yêrivanê bi destê Kurdîn li wir dijin tê amadekirin.

Ü paşê her şev êdî bêtirs min radyoya xwe dibir oda mîvanan. Her şev me sitranê Kurmancî ji radyoya Yêrivanê guhdarî dîkir. Bayê min, mîvanan me yên gundî bi kîfxweşî gotinê xwe dibirîn û dibûne guhdarîn dengê Kurdîn Ermenîs-

tanê. Min wê demê fam kir ku ev xebata ji gelek xebatan hîn çetir e. Ü gelê Kurd bi wesita van kîlaman xwe ji bîr ve nakin. Ü piştî çûyîna min a Üniversite ji kilamîn radyoya Yêrivanê her şev li mala me berdewam kirin.

Heya vê şevê mereqa min ew bû ku ez xwediyê vê xizmeta giring û mezin nas bikim, kî ye û kî nin yên ku vê xebata xweş dîkin.

Min xwest ku ez nas bikim, heyranîya bavê xwe û sipasiya xwe ji wan re bibêjim. Sala 1994 an, meha gulanî ez ji bo karekî li Moskovayê bûm. Bi salixa heval Mehmed Uzun min Timûrê Xelîl nas kir. Lî min nîzanibû ku Timûrê Xelîl kurê serok û berpirsyarê radyoya Yêrivanê ye û piştî mirina bavê xwe wî jî sê salan di wê radyoyê de wek berpirsyar kar kiriye, bûye serokê kar yê rojnama Riya Teze. Ez pê hesiyam ku eger Xelîlê Çaçan bijîya, îsal 70 saliya wî zilamî xwediyê xebata giring û mezin temam dibû. Min dixwest ku di vê roja 70 saliya wî de ez nasdarê wî bim û gotinîn bavê xwe bînim cî him jî mîletê Kurd vî mirovê mezin nas bike û ji bîr veneke.

Xelîlê Çaçan Mûradov di 1924'an li Ermenîstanê, li gundê Kurda ji diya xwe bûye. Di 32 saliya xwe de bûye serokê radyoya Yêrivanê beşê Kurmancî. Hetanî sala 1981'ê; heta mirina xwe 1700 sitranê Kurdî û ji 40'î zêdetir piyesano xistiye radyoya Kurdfî. Ji bo vî karî li nav Sovyeta berê, ciyê ku Kurd lê dijin, li hemû deran geriyaye, kilam û gotinê Kurdfî bi cî kiriye û kiriye ne-

mir. Di nav van salan de mazûvanîya bi sedan mirovê dengbêj kiriye. Bi hezaran meqaleyê li ser Kurd û Kurdistanê bi riya radyoyê pêşkêş kiriye. Bermaliya wî Eznîva Reşit xanim 27 sala peyvkara (spiker) radyo ya Kurdi bûye.

Piştî sala 1939'an li dû bi hezaran kuştin û surgûnên Kurdan, bêdengî wek ewrekî reş ket ser gelê Kurdistana Bakur. Di vê dema muhîm de, piştî çend salan, dengê Kurdan bi saya xebata Xelîlê Çaçan ji Yêrivanê bilind bû û kete her maleke Kurdan. Xelîlê Çaçan ji bo Kurdan bû berojka zivistana sar û ewrê li ber roja havîna germ. Bû bayê ser bêndera. Ew sitara hêviyên gelê Kurd bû. Ew hêviyâ şevêñ reş bû. Wî di emrê xwe yê kin de ji bo Kurdan pir xebatîr û di nav vê xebata giring û mezin de serê xwe dani. Ji her derê Kurdistanê û Kurdenî li welatên din dijin, bi dehan name û telgrafen sersaxiyê hatin. Ji wan rehmetiyê Cigerxwîn wisa nivîs bû:

"....Heval Xelîlê Çaçan stérkeke ges û ronî bû û di şevreşa rewşa mîletê me de ji ezmanî torevanî qurişî û bi carekê de winda bû...."

Xelîlê Çaçan Mûradov pênc pirtûk nivîsandine. Ji van çar hatine çapkîrin:

1- Kilamîn Civata Kurdan. 2- Memê û Eysê. 3- Zembîfîros (poem) 3- Qisîn Cimetê (folklore) 4- Moriyê Nanê (kurteçirok). Eva dawiyê li Holandayê ji aliyê Delflo ïzolî careka din hate çapkîrin Pirtûka wî ya pêncan jî zûtîrê wê li Ewrûpayê bê weşandinê.

Ü pîrsa dawiyê: Xelîlê Çaçan! Tu dikarî rihet razê. Gelê Kurd êdî hişyar bûye û ketiye nava şerê azadiyê û di wê hişyarbûnê de keda te jî heye. Bi sedan nivîskar, lêkolîner, dengbêj û partizan hene, şer dom dike û navê te yê delal û pîroz û xebata te herdem wê di bala me de be.

İBRAHÎM KUREKEN

**NAMÛSA
ÊMO**

Sahînê Bekirê Soreklî
Namûsa Êmo
Weşanên Haykurd,
Stockholm, 1994, 112 r.

Laleş Qaso

ZINDANÊN
DIYARBEKIRÊ
U
SOREŞGERİYA ME

CILD 1

WEŞANEN PELDA

Laleş Qaso
Zindanên Diyarbekirê û
Soreşgerîya me -Cild 1
Weşanên Pelda, Stockholm,
1993, 285 r.

**HÊZ Ú BEDEWIYA
PENUSÉ**

Mehmed Uzun

MEHMET UZUN

Mehmet Uzun
Hêz ú Bedewîya Pénusé
Weşanên Nûdem,
Stockholm, 1993, 203 r.

Jİ GERNAMEYA MARCO POLO

Li Asyayê

3

Werter ji Swedîc Mihemed Dehsîwar

...Nuha em tê Ermenîstanê mezin-2-

Ew gola ku li jor hat baskirin, Gola Abakû (Hezer) ku dora wê ji aliyê çiyayan ve hatîye girtin, ava xwe ji van çemîn mezin wek Herdil (Volga), Geichon (Gîhon), Kura, Aras (15) û gelek çemîn din digre. Bazırganvanen Genua (Cenova-İtalya) niha dest bi seyr û seferen xwe kirine. Ew ji vê heremê cawekî şîklê hevrîsim dikirin ku jê re ghellie tê gotin.

Li vî welatî bajarekî sipehî bi navê Tîflîs heye ku li dora wî û li qeraxen wî mehleyen asê û saxlem (ketina wan zor) hene. Li virê Ermenî, Gurciyên mesihî û her wiha hinek misilman û cihû dijin. Hejmara yên ku me dawî bas kir ne gelek in. Li virê cawê hevrîsim û gelek şikil caw û tişten din tê çekirin. Gelê vir di bin hikmê qralê Tataran ê mezin (16) de dijin. Niha em tenê qala bajarê mezin û giring dîkin, lê ji bili wan jî gelek bajarê din ku ne zêde giring hene ku em pêwîst nabînin li ser wan biseknîn. Ger di pêş de sebebîyetek çêbe, em dê li ser wan binivsînin.

Piştî ku me li jor basa wan bajarê dikevin jora Ermenîstanê kir, niha jî em dê dest bi wan bajarê ku dikevin başûr û rojhîlata welêt bikin.

Mûsil (li ber Dicle ye) welatekî wisan e ku gelên curbecur têde dijin. Hinek ji wan Mihemed dihebinin û ji wan re Ereb tê gotin. Yen din xwe wek mesihî dihesibînin lê bi tevayî hisk bi Dêra Romê ve girêdayîne. Çend cure xelq xwe ji wan diqetîn. Ewana Nestûrî, Yaqûbî (17) û Ermenî ne. Pitrikekî wan heye ku jê re Jacolit (18) dibêjin û ew pîskoposan sereke, pîskoposan û serokên rahîban teqdîs dike û wana bi gelek deran ve dişine; wek Hindê, Kahîrê, Bexdayê û cihîn din ku mesihî lê dijin, bi her awayî wek Papa, papayê Dêra Romê.

Ew cawen ji zêr û hevrîsim hatîye çekirin ku jê re müslîn tê gotin li Müsilî tê hazirkirin û hemû bazırgan û ticaretvanen mezin ên ku barên mezin ên biharat û malên beqqafîyê ji welatekî dibin yekî din ji vê heremê tê. (19) Li dora çiyayen welêt Kurd (20) dijin ku qismekî wan mesihî ne û bi mezhebê Nestûrîyan û Yaqobûyan ve girêdayîne û wekî din jî Mihemedî ne. Ew bi tevayî esatîn bê qanûn in û karê wan şîlandina bazırganvanen e. Li kîleka vê heremê du bajarê din hene ku ew jî Mûs û Mêrdîn in. Li van deran gelek pembû tê çandin û jê destmalen ku jê re bocasînî tê gotin tê çekirin û wekî din jî gelek malen din li vir tê çekirin. Gelên vir bi karên fabriqeyan û bi ticaretê ve dibezin, lê di bin hikmê qralê Tataran de dijin.

Niha jî dê em li ser bajarê Bexdayê biaxîfîn

Bexda bajarekî bi quđret e ku berê li wir xelîfe yan jî papa hikumdarîya misilmanan dikir. Çemek mezin (Dicle) di nav bajêr de diherike û bazırgan jî malen xwe di ser vî çemî de dibin heta Deryaya Hindê û tînîn. Navgera van her du cîhan ji ber şîşar û helezonen nav çem 14 roj tê hesibandinê. Yen ku vê rîwîtiyê dîkin, piştî ku ji Dîcleyê xelasdin digjin cîhekî bi navê Kisî (Kîsch) û ji virê xwe berdidin ser deryayê. Lê berî ku ew bigîjin deryaya bê ser û binî di ber bajarekî de diçin ku navê wî Balsara (Basra) ye. Li der dorê bajêr komikên darên xurmeyan hene ku di dinê de xurmeyen herî xweş û qenc li wir çedîbin.

Li Bexdayê hevrîsim bi zêr tê dirütin û her wiha hem cawê tevneyan û hem jî qedîfe bi gelek şikil û cureyên heywanan tê xemîlandin. Nêzî temamî mîrânîn (pârla) ku ji Hindê tê û diçê Ewrûpayê li virê tê qulkirin û çarçovekirin. Qanûnî Mihemedî (islamî) li vir bi armancen xwendîna zanîstî (ilmî) jî tê bikaranîn; wek sîrê (magi), fizik, astronomî, geodesî (zanîstîya li ser dinê, MD) û fîsiyonomî. Li vê heremî dînî ev bajêr bajarê herî mezin û giring e.

Xelîfeyê ku di jor de jê hat baskirin xezîneyen herî mezintîrîn -ku tu mîr nikarîbû bida hev- ji xwe re da hev, lê dawîya wî jî di bin şertîn gelek xerab de çû. (22) Di wê demê de wextê ku serdarê Tataran imparatorîya xwe fireh dikirin, ji nav wan car birayan yê mezin ku navê wî Mangû bû, hikumetê ji koşka paytextê qralîyeta xwe idare dikir. Piştî ku ewan welatê Kataia û der-dorê wê xistibûn bin desten xwe qeweta wan i leşkerî ya êrîşker zêdetir bû. Li ser vê qerar dan ku welatekî gelek mezin û bi heybet ava bikin û her wiha temamî dînî di nava xwe de parêvekin. Ji ber wê jî ew li hev hatin ku yek ji wan bi ser rojhîlat ve bimeşe û bi dest xe, yekî din başûr fetih bike û her du yê mayîn jî welatê xwe bi alîyê din ve fireh bikin.

Ulaû (Ulux Xan) bi ser başûr ve girt û li wir bû xweyê qewetek mezin. Ji ber ku welatên di ser riya wî de jê re serî danîn, Ulux Xan di sala 1205 an de bi ser bajarê Bexdayê ve ji girt. Lê kingê ew têgîhîst ku bajêr çiqas mezin e û çiqas bê hesab meriv tê de dijin, ne xwest bi şor lê bi dek û dolaban têxe destê xwe. Ewî xwest ku dijminê xwe di derheqa hejmara leşkeren xwe de şas bide famkirin ku ew ji bili peyadeyan sed hezar siwarî bûn. Qismek ji leşkerê xwe danî alîyekî bajêr û qismek din jî di alîyê din de bi cih kir ku ew ji teref daristanê ve bîn xefîkirin. Ewî bi xwe jî qismî mayîn girt û êrîş bir ser derîyên bajêr yê herî mezin.

Çand û wêje

Beşek ji pirtûka "Sîsirkê Hesinî"

Herifîna BIRÂVAYÊ

Selîm Berekat

Birîva tu çiyî ? Tu zixtek ji he-riyê yî, tu jen û dilê herîyê yê tozînî û sergerdan ì, tu baskên gundan ì ey Birîva. Ey ewreke tozgîrî û lawaz û bi şermezarî di-hinguve zemînê ku mal bi mal li hawîrdor çavkaniyeke nehînî û ji toz û westanê komdibe. Ma bi rasû-tu gundekî? an tu çinge çînga taristanê yî dema cara pêşîn peya bû ye ser zemînê û tenhaî çandîye ? Tu balkêşî ey Brîva, tu balkêşî weku rojekê di neynîkên gundan de ji nişkê ve te xwe dîtibe, te reşekî bê ling dîtibe, reşek ku di navbera xernûb û pelên kav-kulîkan de dixijiqê destê xwe, bi lavlaveke dawîn berzûrî nediyariya ku derewên xwe wekî gayan dajo û li dor xwe nazîvire, dirêj dike. Erê Brîva. Ey şebenga gundekî, ey pencereya axê bi ser axê de, dê tu kesî navê te ne-bihîstiba ku ne ji Boxê bûya, ku ji vî dêwê ku peyivînan ew afiran-diye an ewî peyivîn afirandîne. Ma Boxê nedîtiye, Boxê ku navê Boxê Birîva hatîye nasin .

Em ên zarok me ew nedîtiye lê me gorra wî ya li ser Girê Moza ditiye.

Ji gundê moza bi xwe me da ser reça gir, di nav mîweyên tîrî re, em goşiyên reş ji vir û ji wir radikin, em libêñ goşyan bi dû xwe de belav dîkin, weku yê ji rîwiyan re şopekê ber bi bêhudeyî de dihêle. Goşî pir şérîn bûn, toza ku li ser wan bû wek toza ku li ser zemînê bû, me dizwarin, me guh nedida wê çêja têkelaw ya teybet-mend, an ji me di nav destê xwe de diguvaştin, ji bitî, lewra dibû xweşavek ji heriya reşî mezeloqî; paşê em destê xwe bi axa reş dişon, rîya ku hêdî hêdî li ser qî-raxên gir wenda dibû, ica em xwe davêjin ser xaçerêkên teng ên co-kan ku pişî westanekê me digi-hand serê gir.

Serê Girê Moza serrast e, miş goristanê bê nîşan e, me xwe dip-arast-em ên zarok ku em pêl tu gorê nekin da ku mîri şiyar nebin, her weha me xwe ji qulêñ ku li vir û li wir belav bûyîne ji diparast, çînkî ew ji yên lawirêñ mirîyan, lawirêñ ku bi şevê ligel cewrikêni bi hestîyan dîkin û ku têr dibin, gewriyên xwe bilind dîkin û di-reyîn, reyandinek ku bi nalina şevê û bûnnewerêñ şevê tevlihev e.

Li ser serê gir ku seraste û di-nava gorren bi erdê re rast bûnê û ji bilî kîlêñ wan nexuyane, di

nava wê bedeniya westiyayî ya ser xweşî bêdost û hogir, Boxê Birîva dirêj kiriye û bi perçeyên qehfikan nixumandiye..; Bi dirêjahiya sê metran, bi rasti yê herî dirêj e, yê herî pane, lê ta rada dîsotinê bê guhdariye, gerek bû, ew porkurêñ ku rojekê wî bi oxir kirin, ta hezar salî hilkişiyana ser gir û daketana, gerek bû hawar-hawara wan bigîhişa wek ku çawân lingêñ gir dighêjin rehêñ bakur, gerek dawîya Boxê Birîva" ne bi wî awayî bûya, gerek dengê wî yê ku hêdî hêdî ji hinavê me bilind dibe ne bi vî awayî wenda bibûya (em ên li beramber zorba-ziya wêranê, bi çavne ku bi laşekî sê metro û parçeyên qehfan hatîye nixumandin hatîne dagirtin, raw-estiyayî ne.) Û dengê wî ji xwe bawer e- wek ku destanbêj dibêjin dengekî rewan wek laşê wî yê re-wanî dirêjkirî. Dibêjin ku Gund li ser piyan dibirî, çînkî di bin gira-niya wî de tu qantirê nedîsiya pêdariyê bike. Xurttîrin qantir hema du gavan dîcû û paşê pişta wî xwar dibû û zikê wî dihingîvî erdê.

Destanbêjan li alîne dîtir dijîyan vî dêwî de digotin, li ser dewla wî ya ya taybet ku bi qasî bîst dewlîn normal bû dipeyivîn. Boxê bi tena serê xwe av pê ji bîrê dîkişand û kulekîn xwe av dîda li ser ku çawân tenûrek nan dixwar dipeyivîn. Li ser wan dergehîn bilind ku têrî dirêj bûne wî nedikîn ica xwe diçemand da ku derbas bibe, dipeyivîn.

Li ser kuçikê wê yê wek kerekî ku herdem lîgeh hevdû li ser tixûban diyar dibûn, dipeyivîn du formîn afsanewî ku tu car ba-bîskekê ew ew veşartine, her berbang li gel hevdû ji wê tenge-riya mezîn ya li rojhîlatî "Birîva" derdiçûn, ji teneriya ku rojekê ji rojan çem bû, lê vê dawîyê bûbû axureki havîni bo mih û beranen Boxê.

Li ser bejin mana wî dipeyivîn, lê me çîrok xweşik û weku pêwîst bû fam nedikir, lê wa diyar bû ku tu kes nexwestibû bin fe-diye bi xwestina mîyekê.

Boxê Birîva" hetanî berî ku kur-tepit di nav xelkîn gund de çêdibe, pir bêdeng bû: "Èn xurt erdê dabeşdîkin". Bêgûman tiştekî nû bû ku hinin xurt li ser hespîn xwe bêñ û dibêjin:

"Sinorê me eve û sinorê we ew e". Zemîn serast û bê sinorâbû, se-rast û ron wek pirsan bû, lê vaye

çeloxwarî bibe wek bersivne biyan...

Ica erd li hawîrdorî Birîva teng bû û xelkîn wê jî hew dişen kulekîn xwe pêtirî çend metran derxînin. Wê gavê Boxê yê ji xwe bawer û ji rewaniya xwe ya ji xwe bawer derdiçe. Rahîş kevir-ekî bi qasî metrokê bi rîket û zil-am li pey wî dibêjin ku ji meşê westiyan lê Boxênewestiya. Dibê-jin ku rûniştin ê xwêdana eniya xwe di wê nîverojê de paqîj kirin, lê Boxênewestiya û dibêjin ku diçû ta ku ji ber çavan wenda bû û dibêjin ku Boxênewestiya li xaniyên wan xorîn biyanî kir, ewên ku xelk bi dabeşkirina erdan agah kiribûn, wê gavê kevir ji ser milê xwe avêt û got: "Hâ sînorê Birîva ev e" û vege riya û dibêjin ku yek ji van xortan li ser hespê xwe bi pey ket û dema ku hat teniştâ wî, Boxêhesp dehf da û avêt erdê û piyek ji piyêñ wî qurifand, bi ser zilam de qîriya û got: "Bi pey min nekeve" Pişî wê nema kes bi pey ket.

Lê tu kes ji me re nabêje ma ka gorra Boxê Birîva" li ser Girê Moza ci dike. Ji xwe Birîva û Moza du gundin û qonaxek dirêj di navbera wan de peyda dibe?

Ma ka ci bi kuçikê wî hat, kuçikê ku gelek caran li ser serê gir dihat dîtin ku dengê xwe bi re-yandineke tal bilind dikir, li rada sê salan, li bin tava heyvî an li bin vedana birûskan dibiriqî?

Ew jî mir, em ên zarok wa bawer dîkin, wekî xwedîyê xwe ew jî mir, bê xirecir û

Bê hajêkirin. Ma hûn dizanîn çawa (Boxê Birîva) mir?

Destanbêj dibêjin ku, kulekîn Boxê bi halekê ketibûn, hiriya wan di weşîya û kwînîr û laşê wan de çêdibûn, yek bi du yekê da diketin û dimirin. Berbeyaniy-ekê Boxê ji xemxura (qelş-tengerê) rûbarî derneket. Dema ew dîtin, pişta xwe sipartibû ke-viya kortalê, bi hiriya gemarî dor-pêçkirî bû, lê kuçikê wî li hawîrdor digeriya û direya. Me dipirsî. Em ên zarok- ma gelo çavêñ wî girî an vekirî bûn, tu kesî bersiv nedida.

Ü me xwe ji ser Girê Kîlanê ber bi jîr ve berdîdan. Girê ku gelek caran denen ji karbana buha û ji zîv têde hatibûn dîtin, di nav deshîn rût û ali rojhîlat re me berê xwe ber bi bajêr vedikir, lê bajar nema ew bajar bi xwe ye lê anuha wek leşkergeha pasvanen



çolistanê têt xwiyakirin, ango Hecana 1-mîna ku wan dinavîn. È me ji me qet li sedema hebûna wan leşkeren "şawi" nedipirsî, lê belê wan bixwe, bi dijwarî û bi rûşustîn dan xwiyakirin ku "mezinan" hin rîk û pêk kirinê nehînî ji Cezîre re amade kirine.

Dem dema sazkiran bû, lê xelkê ji dema ku tuxum peyda nekirin rabûn parêñ xwe jî dane dewletê, wusa împeratoriyeñ piçük dest bi hilweşandinê kirin, împeratoriyeñ hêzdaran û xwenêñ piçükîn bê hêz jî: Her tiş çû, wek lehiyê sîmâyîn paşerojê bi zaroktiya wê û bi çûrisîna wê ya afsanewî û xweşik, li ber xwe bir. Ü wexta ku lehî hedînî her tiş bi heriya sor ku şûna jiyanê tê de nexwiyabû, hatibû nixumandin. Ica di behîşa genim de genim nebedî bû û em ên zarok -ica li ber dergehîn nanfiroşan kom di-bin, reng e em beşekî ji rojê raw-estîn bêyî ku em nîn bidestxînîn, çînkî Hecana ên pêşî ne, çendin car wan zorbazan zarokek an pîremêrek davêtin dervî komê; da ku di nav rîzan de cihê wî ji xwe re wergirin. Çendin car rîz diqe-laştan û sile li bin guhê nanfi-roşan dixistin, an bi pêlavêñ leşkerî pêl wan dikirin hetanî ku xwîn ji guh û ji devan bipijiqiya.

Pişî hatîna Hecana pirbûna piştevanen hezdaran hew bi kîr tê. Ü perîşaniya perîşan ji pişî hatîna Hecana hew bi kîr tê. Ji xwe êrîşkirina wan a li ser bajêr êrîşkirineke bi wexta tunebûna genim re hemdem bû, herweha hemdemî pîrsen xelkê bû : "ka nanê me"? Wê wextê em zarok bûn . Ji bo me 'Enûd pir balkeş bû. 'Enûd mî bû lê wek zilaman igal dida serê xwe, kirasê zilaman li xwe dikir , gumdekê zilaman, herweha wek zilaman de-bançe li newqa xwe girêdida . Turumbêl û paşmîrên wê hebûn. Lî 'Enûd keça şêxê mezin ê Ereban, ew pozbilindiya wê, pişî hatîna Hecana pir dirêj nekir. Lî piştre, ligel gûrkirina pêla "Sazkiranê xweşik" me naskir ku ji xwe em ji li ser anuha ya afsanewî bûn xwedî nîrîn übîyiar her şêxek ji şêxen Ereban û hezdareki kevn xwedan pişgîrî, careke di împeratoriyeñ wan li wan zîvirandine. Lî belê yen

perişan hetanî hestî bê hêvî bûbûn, ligel bêhevîbûnê termen Hecana li kolan û rûbaran dest bi komkiranê kirin. Xelk ji sitemka-riya rojane bêzâr bûn û ji ewen ku dismalen sor li ser serê xwe datanin û kirya xaniyêñ xwe nedîdan.

Ji ewen ku nanen subehî ji wan distendin û êrişî malan dikirin hema ku zarok pevbiçûna, bêzâr bûbûn. Wexta agahbûn ku ew ha-tine daku pirsan ji ser lêvan hilînîn, xefkîn şevînî ji wan re vedan û endamên wan bi bêr û dasan tar û mar kirin. Ü dema û çîrok belav bû, Hecana rahiştin xewnen xwe ên çolistanewi, ên ku bi pişkolan re tevlihev bûbûn, û careke di vege-riyan çolistanê, pişî wê yekcar hew vege-riyan. Lîbelê ew împerato-riyeñ piçük, ên ku hilweşî bûn, ji xwe hilweşandi man.

Ü ligel wê hatîna bi tof ya bez-ariya esmanewî, çayxaneyen dest pê kir ji vê koşê û ji wê koşê der-diketin. çayxane yan bi hesîren ji pûş hatibû raxistin, êvariyan zil-am li wir kom dibûn, an piraniya şevê li ber ronahiya çîren gazê dibuhirandin, digiriyan û le net li kaxezîn lîskê dibarandin, kax-ezen ku bexten wan pêkenîntir dikir, an hevdû didan ber kursiyen xêzeranî, pistî wê dihedinîn üvedgeriyan xirecir û qireqirak bê dij warî. Qehra me biçük dest pê kir, û roj bi dû rojê de mezin bû, bo qehra ji çayxaneyen, û ji tirêna bajêr a ku ji wê pêve nebû, ji aşen genim ên otmafik , û ji kark-nya bûzê, ûji balefirxane, ûjiçem. Ü ji malen taxan ên herfini, û ji minaran, û ji hejariye. Em ji her tişti qeherin çînkî em nebûn xwediyê tu tişti.

Di nava wan xewnen me ên nedîyar de ku em bibin xwediyê lîskekê, an centeyke xweşik ji bili wê bêhûdeyî me ya dijwar. Ica mîna ewrekî bi lez me ew ber da, em ji li gel Abo yê kor ê ku zemînê gav bi gav û bajar kolan bi kolan nas dike hatin berdan. Abdayê ku tengerêyên metirsyanen yê ku diçin Tirkîyê nas dike, yê ku mîna kûçikekî deng kefî disti-rê.

Ü Abo sih salî ye, bas e û den-gê wî qalind e, li gel ku kore ji, tu carî dar bi kar naniye, lê hergav

KEVIRÊ ROJÊ -v-

Hemû tiştên guhertin, hemû pîroz dibin,
Her jüreyek navendeyê cihan e,
Şeva yekemîn e, roja yekem e,

Dema ku herdû hevdû himbêz diken cihan ji dayîk dibe,

Dilopek ronahî hinav naîn

Ü jûre mîna mîweyekê vedibe

An mîna stérkek hêmîn û bêdeng diteqe

Ü yasayênu ku circan keritandine,

Şîşen hesinî yê benkan û girtûxaneyan,

Çeperen kaxezî, têldirr, zengil, strî û teras,

Penda çekêne yekfîl,

Dûpişka nermin a bi kumik,

Piling bi kumê pêşwaziyê, serokê komeleya

Şînahîperestan û xaça sor,

Kerekî perwerdeker, súsmarê ku rola rizgarîxwazekî dilize,

Bavê milletan, serdar, kosemasî, endazyarê pêşerojê,

Beraz bi cilû bergên resmî ye, kurê kinişte yê hilbijarte,

Diranê xwe yî reş bi ava pîroz dişo û dersên ingilizi

Ü demokrasi fîr dibe, tûnelên nexuyayı,

Serçavkêni rizyayı yênu ku mirov ji mirov cihê diken

Ü mirov ji xwe yaxwe jî, tev di kîlîkek payedar de

Dikevin û em yekitiya xwe ya windayî dibînin

Hejariya hebûna xwe dibînin, û şanaziya hebûna

Xwe jî, beşkirina nan û hetavê, mirinê,

Ü surdariya jiyanâ ji bîrkirî.

Evîn pevcûn e, cihan têt guhertin

Dema ku evîndar hevdû maç diken

Arezû bigewde dabin, raman bigewde dibe

Ü li ser milêne kole bask gesdibin,

Cihan hestpêkiri û rasteqin e, mey meye,

Xwarina nan jibo nan vedigere, û av ave,

Evîn pevcûn e, vekirina dergehan e,

Evîn angô rawestana mirov li dijî ku bibe siberek

Bi hejmar, li dijî ku bi zencîra hetahetayîyê

Bête sezâ kirin ji alî serokeki bê rû, cihan têt guhertin

Dema du mirov li hev temaşe diken

Ü hevdû dinasin, evîn ku em xwe ji navîn xwe rût dibin,

"Wext bide min ku ez bi gehpa te bim",

Evana axaftinêni El Wayz in, lêbelê serê

Xwe ji yasayan re xwar kir û ew mehrir kir

Lewra bi xezandinê hat xelat kirin,

Ü ya jê çêtir tawan e, evîndarênu ku xwe dikujin,

Bikaranîna qedexekirinan di navbera xwîşk û bira de,

Neynik in jin yên di çesne xwe de hez diken

Xwarina nanê jehrewî çêtir e,

Ü sozanî Zina di nav nivînê xwîlyî de,

Evindariya gêjahiya dirindane, û lavlava wê

Ya jehrewî, nêrbazê ku(qûndek) wekû

Qurnefelekê tîfî li ber singa xwe hildigire,

Ku mirov li gorepanekê bête kevirbarkirin

Çetire ji zîvirandina wê coka ku kakila

Jiyanê derdibire, û hetahetayîyê dike

Katjimêrine vala, û kîlîkan dike girtixane,

Ü demê dike perçê pereyên ji sıfir û ji pîsîtiya derûnî

Pakî ji gişî çetire, gulek nedîyar li ser

Piyen bêdengiyê li ba dibe, elmasa dijwar ya

Çak-peyayan ya ku arezûyan bêjing dike,

Demê têr dike, zemawenda aramî û bizavê,

Tenhatî di nav xunca xwe de distirê,

Her katjimêrek şaxegulek kirîstîlî ye,

Cihan ji serçavkêni xwe rût dibe û di navendê de

Tenkûnike pêldar, ewî ku em nav lêdîkin

Xweda, bûnewerê bê nav,

Bûnewerê bê rû ji xwe ya xwe derdipere,

Hetava hetavan, miştbûna bi amadeyî û navan,

Bi dû gêjahiya xwe dikevîm, jûre, kolan,

Bi koranî di navbera tengerêcîn demê re dibuhîrim,

Hildikişim û dadikevîm, dest li dîwaran didim û

Nalivim, vedigerim sîna ku jê hatime, li

Rûyê te digerim, di kolanîn xwe re dibuhîrim li

Jêr hetav bê temen, tu jî li tenîşa min

Çesê darekî bi rê dikevî, çesê rûbarekî,

Tu birê dikevî û mîna cokekî bi min re dipeyivî,

Di nav lepênen min de wek gulegenimeke geş dibi,

Tu di nav desteninde wek simoreyekî dilerizi,

Tu difiri mina hezar balendeyî, kenê te min bi kefî nixumand,

Di nav desteninde serê te wekû stérkek piçûke

Cihan rengê kesk werdigire dema ku tu dibisirî û tu pirtiqalê dixwe

Cihan têt guhertin dema ku du evîndar gêjîbûyî

Ü hev himbêzîrî bi ser gîha de dikevin,

Eşman dadikeve, kulîlik radibin ser piyan, û boşayî tenha dibe ronakî

Ü bêdengî, boşayîyek vekirî bo sisarkê çav,

Ü elâ ewrîn sîpi dibuhire,

Laş zencîran dişikîne, û gîyan lenger berz dike,

Vêca em navê xwe wenda diken û ser av dibin,

Di navbera keskahî û şînayiyê de dibuhîrin,

Demek giştî bê rûdan

Tenê birêveçûna wê yî bextiyarane.

Oktavio Paz



Jiyan û berhemên
O. Paz

1943-1945: Li Amerikayê dijî. Helbesten Yêts, Pawend û Kamincis pirr bala wî dîksinî. Rober Frost û Kamincis û Pawend ji nêzikahî ve dinase. Ü di sala 1946'an de besdarî endematiya rîexistina diplomasî ya welatê xwe dibe.

1946-195: li Parisê dijî.

Peywendiyê w xwe bi surealizmê re xurt dike.

Brêton û Mîşo dinase û besdarî belavokêne surealizmê dibe.

1950: "Laberênta

"Tenhatiyê" belav dike. Di vê pirtûkê de bi awakî dûrûdirêj li ser rewşa civakî û mirovî ya Meksikayê radiweste.

Herweha "Baz e an Roj e" pirtûkê helbestan çap dike.

1952: Serdana Japon û Hindistanê dike. Li ser wêje. çand û felsefeya Rojhîlat radiweste û beşike jê belav dike.

1955: Vedigere welatê xwe û li Zankoya Meksikayê mamostatiyê dike.

1956: Pirtûka "Kevan û Mandolin" belav dike. Di vê pirtûkê de bîr û baweriyê xwe li ser ezmûneya helbestî û pevya helbestî tîne zîmân. Komikek şanogeriyê bi navê "Helbet bi dengekî bilind" dadimezirîne.

1957: Balkêstirin berhemâ xwe çap dike. "Kevirê Rojê"

1959-1962: Vedigere û li Parisê bi cih dibe. Di sala 1960'ı de çapa pirtûka xwe "azadiya merckirî" careke din dubare dike; helbesten xwe yî berî sala 1958'an di vê pirtûkê de belav dike.

zarokek wî dajo, an jî dîwaran rapelîne û panahîya kolanê ku ji ber kiriye derbas dike. Ü Abo natirse. Abo Şahzade yê çem e.

Dema ku dadiket avê, rûtîzlût em li ser her du kenarê çem bazidan, hetanî qirika xwe bin av dibûn û desten xwe dihingivand bînê çem ku tev herfî û pirk bû.

Her bînikekê masî-panek an tîşqemasiyek çeman ji me re davet û eger nêçir kembuya, berî dîda qulan, desten xwe radida wan û bi kişandin kevjalek an marmasiyek derxist, qapaxa ji hestî ji ser pişta kevjalek radikir û digot: "Temaşê bikin, ev katjimêra wî ya goştinî ye" an jî dibêje" Ha ji teriya marmasi hebin bi jehr e" û bi diranê xwe qasî deh santemân ji teriya wî qut dike û Abo mar jî digirtin, ew bin av dikir û bi qirikê digrt, dema ku serav dibû bang dike: "Gumlek min bînîn" Em gumlek didinê û Abo gumlek dixe devê mar, pişt re dijdîne û diranê mar hildike. Pişt re bi lê ewlebûn dixe berika xwe û xelkê pê ditirsine.

Em didin dû Abo û em li hemî çayxanan digerin. Ji zarokê ku bi dest girtiye dibêje: "Filankes şanî min bik" Ü şanî wî dike. Abo nêzîkê zilam dibe û dike kurtepist: "Deynekî min di hustê te de ye" Zilam dikene û peran dixe de stê wî.

Hê roj neçûye ava an buhayê derbasbûna sînemê didin hev. Abo li lokalê rûdinê û rûyê wî ber bi jor ve ye. Di navbera du kîlîkan de li ser birêveçûna bûyeran ji me dipirse, dema ku em jêre dibêjin madê wî xwes dibe an jî dike hîqehîq û me jî bi hîqehîq dixne.

Ü Abo mîrê du jînên parsek e. Ew bi hev re, li mala xwe ya di çesnê axurekî teng de, kom kîrine, yek ji wan "Şûşê" ye, di gîrsbûna filekê de ye, hergav xwas e, ji xwe gumeguma piyên wê yê pan wek gumeguma sîmîn gamêşekî ne. Eger derbasî malekê bibe, tu carî bê deskeftinkê dernakeve ku xwedanê malê razî bin an nerazîbin.

A dî navê wê Basî ye. Perîsan e û hişê wê tu carî ji hişê mirîsekê pêtir e. Lî herdem Şûşê û Basî li kolanan pev diçin û herdem Basî bi porê xwe yê gijo mijo dikeve erdê û direye pevcûneke ebedî di navbera du hewiyan de, pevcûnek û Abo hergav bêali radiweste, û ya xurt haş dike. Pevcûnek, em ên zarok, bi qîjeqîja xwe, xurttir dikin, em li dora wan dibin xelk û em yekê li ya germ dikin, îca weke du dîkan hevdû di nikulîn û di şûna perikan de pîne ji wan difirin, pişti wê em ji hev re dibêjin ku Basî mir û Şûşê ma. Ma wek sultaneke li ser Abo û mala wî ji xwe ahengek li Abo naçê, herdem wek ku çâwan tembûr û def amade ne ew jî amade ye. Li wir li bakur aheng havînan destpêdîkin. Heft roj û heft rojan toz bi ser serê semageran dikeve, wek gerdeniyek jinan xwe li dora çira gazê ya bi stûnê daliqandî digire. Herweha xwe bi herdu çavê Abo çavê sîpî yênu ku dûtir dibînîn dike. Çavê ku xwînê û gera xwînê de rehan de dibînîn û navan helkelîka yê dîstir de dibînîn.

En govendger di xelekekê dicin û di nêvî de daholvan bi daholîn xwe yê bêrîtim ji bili gurmîna cgerdar, piçekî dûrî xeleka govendê em li dor Abo

Wergerandina ji Erebî:
Ehmed Huseynî

KİTABÊ PÎROZ Ê ÉZİDİYAN: MESHEFÎ RES

Meshefi Reş yanî Mishefa Siya kitabê pîroz (muqeddes) ê Ezidiyan o. Kirdasi (Kurmancî) nê kitabî ra vanî Mishefa Reş. No mishef pey elfabayeka ciyay nusiyawo. Na elfaba ne elfaba 'Erebki ne Ibrankî ne zî Suryankî ya, yanî na elfabayekda xusûsi ya. Tekstê nê mishefiyo ki mi na elfaba ra tadowî û ez tiya di çap kena bi leşçeya Kurdiya Başûri (Kurdiya Cenûbi) nusiyawo.

Meshefi Reş o Kurdkî bi xwi raya verîni Anastase Marie, Ezidiyan het ra 1904 di peyda kerdo. No tekst 1911 di Anthropos di vijayı. Maximilian Bittner'i zî 1913 di no tekst transkribe kerdi, tâdabi û newe ra vetbi. Dima 1991 di Peşrew Kerim Ehmedî Meshefi Reş tada herfanê 'Ereban ser û vet.

Mi no mishef verî herfi bi herfi elfaba Ezidîkî-Kurdî ra tada herfanê elfaba ewroyin a Kurdkî ser, dima telaffuzê yê gore mi newe ra nuşt. Mi tekst bi xwi, transkrişyonê Bittneri û ê Peşrewi tê ver nay. Bêguman mi tekstanê nê her di kesan ra istifade kerd, labelê him Bittneri him zî Peşrewi tanî şâşey zî kerdi. Mi şâşey inasarêni û ferqê nuştişê xwi û ê yînî notanêbinenan di nawîsi. Çiyanê ki ez ti ra emîn nébiya ez Kordanê Başûri ra Aso Germiyanî ra persaya, yê zî ardîm kerd. Ez yê rî sipas kena.

Tekstê Meshefi Reş'i bi xwi di işaretê nuştişî (nuqta, virgül û aw bîni) çini, namey kesan û cayan zî bi herfa girdi dest pey nêkenî. No semed ra gama ki mi tekst newe ra nuşt, mi te de işaretê nuştişî ronay û mi herfa verin a nameyanê kesan û cayan girdi nuşti. Hûmarê ki vernîya cumleyan di yî zî tekstî bi xwi di çinêbi.

MALMÎSANIJ

MESHEFÎ RES (1)

1) Ewwel car Xuda le sirr[i] xoşewîstî xoy gewherêkî sîpi xeliq (2) kird û (3) kotirêkî xeliq kîr (4) [kird], navî [navî] na Enfer û gewherêkey (5) naye ser pişti w çîl hezar soll (6) le serî danişt.

2) Ewwel rojî ke xelqî kird, rojî (7) yekşenbe bû; melekêkî xeliq kird, navî na İzraîl, ew iş Melek Tawûs e ke gewrey(8) hemû-yan e.

3) Rojî düşenbe Melek Dardaîlî (9) xeliq kird ke Şex (10) Hesen e.

4) Rojî sêşenbe Esrafaîlî (11) xeliq kird ke Şex Şems e.

5) Rojî çwarsenbe Melek Mîkaîlî xeliq kirdûwe (12) ke (13) Şex Ebûbekr e.

6) Rojî pêncşenbe Melek Cibrayîlî (14) xeliq kird ke Sucadîn e (15).

7) Rojî cum'e Melek Şemnaîlî xeliq kird ke Nasreddîn e.

8) Rojî şenbe Melek Tûraîlî (16) xeliq kird ke Fexreddîn e.

9) Melek Tawûsî (17) evî [ewî] kird be gewrey ewan.

10) Le paş da sûretî hewt asman û erz û hetaw û mangî xeliq kird.

11) Fexreddîn insan û heywan (18) [û?] rûhleber û teyr û wuhûşî xeliq kird û le gîrsanî xirqe (19) da-yân û legell (20) melaîke le gewhereke hate derê, ne'reyekî (21) 'ezîmî le ser gewhereke (22) kêşa (23), cvê (24) [cwê] bowe, bû be çwar letewe w (25) aw le sîki hate derê, bû be behr. Dunya xîr û bê kun (26) be [bû] (27).

12) Cibrailî (28) be sûretî teyr xe-

liq kird û nardî w çvar (29) [çwar] goşey (30) daye destî. Le paş da keştiyekî (31) xeliq kird û le aw da sî hezar soll danişt. Le paştir (32) hat û sakin[i] Layş (33) [Lalis] bû, qîjandî (34) le dunya da berd bestî. Dunya bû be erz û destî kird be lerzîn. Fermûy (35), Cibrail bo (36) aram[i] dû parçey[y] (37) le (38) ge-

where[ke] (39) hêna w yekêkî le jér erz û yekêkî le derkay (40) asman dana. Le paştir l-ewan ra (41) mang û roj û estêre w (42) le rête [y] gewhere-sipîyeke dirust (43) kird, bo ciwanî (44) le aşman (45) [asman] da hefiwasî.

13) Dirext[i] berdar (46) û giya w şaxî bo ciwanî (47) erz xeliq kird, 'ers[i] (48) le ser 'ers (49) [fers] xeliq kird.

14) Xuday gewre be melaîkey güt "Min Adem û Hewa xeliq (50) dekem û de-yan-kem (51) be beşer, le sirr[i] Adem Sehr Ibn Sefer debê w l-ev [l-ew] û milete (52) le ser erz peyda debê; le paştir (53) mileti (54) 'Izraîl (55), ye'nî Melek Tawûs ke Ye'îdiye (56) [Yezidiye] ye, peyda debê."

15) Le paş da Şex 'Adî le erz[i] Şam-ewe nard bo Lalis (57).

16) Le paştir Xuda hate xwarê bo ser Kêwe-Reş (58) û qîjandî (59), sî hezar fîrştey xeliq kird û kirdîn be qol (60); cil soll 'ibadet-yan kird; le paş da da-yîni-ye dest Melek Tawûs (61) û legell-yan cuwe (62) asman.

17) Le paş da Xuda hate xwarê bo ser erz[i] Qud[u]. Fermûy be Cibrayîl (63), xollî (64) le her çvar (65) [çwar] goşey[y] (66) dunya

hêna; [le] (67) xoll û hewa w agir û awî xeliq kird û le twanayî (68) xoy kirdi be rûh. Û fermûy be Cibrayîl "Bibene (69) firdews û le berî hemû darê[k] (70) bixwa (71) her genim nexwa". (72)

18) Le paş sed soll Melek Tawûs be Xuday güt "Çon Adem û neslî zor debê?" (73) Xuda (74) gütü "Emr û tedbir emeye ye (75) ewa (76) dame desti[il] to." Hat be Ademî güt "To genim-it xward?" Gütü "Na, çunke (77) Xuda ne-y[h]êşit." (78) Gütü "Bixo (79), bo ic qaktir e." (80) Le paş xwardin[i] (81) sikî fûdira (82). Tawûs Melek (83) le cennet kirye (84) [kirdîye] derê w bccêy (85) hêşt (86) û serkew[t] bo asman.

19) Le ber sikî tengî pê helçinra, çunke kuni (87) nebû. Xuda kotirêkî bo nar[d] (88) û be dendûk (89) kuni bo kird, aramî kird (90).

20) Cibrayîl sed soll l-ew gum bû, sed soll xembar bû.

21) Xuda fermûy be Cibrayîl, hat û Heway xeliq kird le bin bax-el[i] çepî Adem.

22) Le paş a (91) Melek Tawûs hate ser erz le ber taîfe[y] mexlûqe[y] ême. Cige (92) le padışahanî Aşûrî çend padışahîr-man bû: Neşrûh (93) ke Nasreddîn e w Gambûş ke Fexreddîn e w Artêmûş [Artîmuş] (94) ke Şemseddîn e w le paş ewe (95) dû padışah-man bû: Şabûr[i] Ewwel û Dûwem. Hukm-yan sed û pena soll devamî kird. Le nesl[i] ewan gewrekan-man ra[we]staw (96) bûn ta êste.

23) Û (97) riq-man le çwar (98) padışah e.

24) I-Kahû-man heram kirdde-[uw]e (99), çunke le nawî Xasîye Pêxember deka;

II-Û lobye \$,

III-Û rengî kilf \$ (100).

IV-Masî (101) \$ naxoy[n] bo ihtiram[i] Yûnan Pêxember (102).

V-Ask naxoy[n] çunke merrî pêxemberêk-man e (103).

VI-Û şex (104) û şakirdî [şagirdî] hîç goşî keleşer (105) naxon le ber ihtiramî Melek Tawûs û Tawûs yekêk e l-ew heft xudaye-nawbirawaneye (106), çun-ke sûretî wekû keleşer e (107).

VII-Û şex û şagirdî kûleke nax-on.

VIII-Be pêyan-ewe mîz (108) kir-din

IX-Û (109) be daniştin-ewe derpê lepêkirdin heram e.

X-Le edebxane dest be aw geyan-din

XI-Û le hemam da xo şuştin heram (110) e.

XII-Dirust nîye (111) kelime[y]

(112) "Şeytan" billêyn (113), çunki

(114) nawî xuda-man e. Hem dirust

nîye qise be lefzê (115) bikeyn (116)

ke le nawî ew bika wekû "qeytan" û

"şett" (117) û "şerr". Dirust nîye lefzî "mel'un" billêyn. Hem dirust

nîye qise be lefzê (118) bikeyn (119)

ke l-ew bika wekû "le'ne" w "ne".

25) Le pêş hatinî Isa bo em(120)

'aleme, diyanekey (121) ême pê-

yan degût "bitperestî". Yhwr (122)

[Yehûd] û Nesara w İslâm ziddayetî

(123) legell diyantî (124) ême kird.

Ecem iş weha.

26) Ahab le padışahanî[1] ême bû. Emr[i] (125) be her yekêk-man kird ke nawêkî xass[i] (126) lê bi-nê (127). Pê-yan güt İlâh [Elah] (128) Ahab yaxûd (129) Be'el Zebûb ke Pir Bûb [e] eknûn (130).

27) Padışahêk-man bû le Babil (131), nawî Buxtneser bû w le

'Ecem padışahêk-man bû nawî Axşerş [Exşerş] (132) bû w le

Qostentînîye padışahêk-man nawî

Axrinqalos (133) bû.

28) Le pêş erz û asman Xuda le

ser behr bû, keşîyeke (134) [keşîyekî] bo xoy dirust kird û le

na (135) behran da bo seyr degerra.

29) Le xoy gewherêkî dirust kird

û cil soll hukmî le ser kird, le paş a

(136) pêleqeyekî (137) lê da.

30) Way l-ew (138) 'ecayibe! Le

zecîc û rinkey (139) [ringeý] ew

kêwane w le tozî ew girdane (140)

w dûdkîlî (141) ew asman (142) xeliq bû; bestî w tundî (143) kird û bê

koleke (144) ra-y-girt.

31) Le paş a (145) erz[i] (146)

qufl (147) da w qelemî be dest girt

û destî kird be nûsîtî (148) [nûsîmî?]

hemû mexlûqat.

32) Le paş a (149) şes xuday xeliq kird le zafî w nûrî, û xelq-îş-

yan wekû çirayê (150) le çirayê

(151) dabigirsêni (152), wa bû (153).

33) Xray (154) [Xuday] ewwel be

dûwemî güt "Min asman-im xeliq

kird, helse biço bo asman û site

[site] xeliq bike". Ser kewt û bû

(155) hetaw û b-ewî tirî güt. Ser

kewt û bû be mang. Çwarem (156)

felekî xeliq kird, pêncem (157) Es-

têtrey Subh[i] xeliq kird, şeşem

(158) feraxî (159) xeliq kird.

NOT
kirruştey (abbréviation)
T.(tekstê Kurdkî bi xwi di)

P.(nuştişê Peşrew Kerim Ehmedî)

B.(nuştişê Maximilian Bittner)

Elfabâ Ezidîkî-Kurdî ra ta-dayox:

MALMÎSANIJ

(1)P.: "Meshefi Reş"

B.: "Meshef Reş"

(2)B.: "xeleq" (Bittneri cumley-anê bînan di zî na kelîme wina nuşta.)

(3)K.: "w"

B.: "we" (Bittneri cumleyanê bînan di zî na kelîme wina nuşta.)

(4)K.: "kîr"

B.: "kird"

(5)K.: "gwhryky"

B. û P.: "gewherêkî"

(6)"L"yê na kelîme qalin o,

cuwe ra mi bi di "L"yan nuşt.

(7)"Ke xelqî kird rojî" teksti

<p

P.: "çuwar"
 (66)B.: "guşe-i"
 P.: "goşey"
 (67)Pêşrewî zî no "le" zêde kerdo.
 (68)K.: "twanayy"
 B.: "tuanaî(-i)"
 (69)K.: "bybanh"
 P.: "bîbene"
 B.: "bejbate" [beybate]
 (70)K.: "dary"
 B.: "darî"
 P.: "darék"
 (71)K.: "bxwa"
 B.: "bixwe"
 P.: "bixwa"
 (72)K.: "nxwa"
 P.: "nexwa"
 B.: "nexowe"
 (73)K.: "dby"
 P.: "debin"
 B.: "debê"
 (74)K.: "çda" (Wina fam beno ki na kelîma şas nusiyaya.)
 P. û B.: "Xuda"
 (75)K.: "emyh yh"
 B.: "eme ye"
 P.: "emeye ye"
 (76)B.: "ewe"
 P.: "ewa"
 (77)K.: "çwnkh"
 B.: "çunkî" (Bittnerî cumleyanê bînan di zî na kelîme wina nuşta.)
 (78)K.: "nhyş"
 B.: "neihîşt" [neyhîşt]
 P.: "neyhîşt" (Notê 32. ê Pêşrewî ra fam beno ki yê herfa verîn a na kelîma 'e (eyn) wenda.)
 (79)K.: "bxw"
 B.: "bixo"
 P.: "bixo"
 (80)K.: "çaktrh"
 B.: "çak-ter-e"
 (81)K.: "xwardn"
 B.: "wxardin"
 P.: "xwardini"
 (82)K.: "fwdra"
 B.: "fûderâ"
 (83)Cumleyanê bînan di "Melek Tawûs" nusiyawo.
 (84)K.: "kryh" (Beno ki tekstî bi xwi di şas binusyo.)
 P.: "firriye"
 B.: "kirdîye"
 (85)K.: "bcy"
 B.: "becî" [becîy]
 P.: "becîy"
 (86)K.: "hyş"
 B.: "hiş"
 (87)Kurdîkî ya Başûrî di "kun" him yena me'na quli (lane) him zî me'na qini (qeni).
 (88)K.: "nar"
 B.: "nard"
 (89)K.: "dndwk"
 P.: "denükî"
 (90)Herfa "D" ya na kelîma ser o herfa "T" zî nusiyaya: "kirt".
 (91)B.: "da"
 (92)K.: "cgh"
 P.: "cike"
 (93)B.: "Nesrûh"
 (94) Tadayey 'Erebkî yê Meshefi Reşî di: "Artûmûs".
 (95)K.: "paş ewh"
 B.: "paş-ewe"
 P.: "paş ewe"
 (96)K.: "rastaw"
 B.: "rawestaw"
 P.: "rastewe"
 (97)Pêşrewî na kelîma nênuşta.
 (98)K.: "çwar"
 P.: "çuwar"
 (99)K.: "krddh"
 B.: "kirdewe"
 P.: "kirdue"
 (100)B.: "kelî-ş"
 P.: "kilîş"
 (101)K.: "masyş"
 P.: "maşî"
 (102)K.: "pyxmr"
 B.: "peixember"
 (103)B.: "peixember-êk-man-e"
 (104)K.: "şyx"
 B.: "şeix"
 (105)K.: "khlşyr"
 B.: "keleşir"
 (106)B.: "xuday[-i] nawbe-rawaneye"
 (107)B.: "keleşir e"
 Pêşrewî qismê "çünke sûretî wekû keleşer e" nênuşto.
 (108)K.: "pyanwî myz"
 B.: "pêanewe mêtz"
 (109)Pêşrewî no "û" nênuşto.
 (110)K.: "cramh" (Wina fam beno ki tekstî bi xwi di na kelîma şas nuşta.)

siyaya.)
 (111)B.: "niê"
 (112)B.: "kelime-i"
 (113)"L" y na kelîma qalîn vajiyêno, cuwe ra mi bi di "L"yan nuşti.
 B.: "bilein"
 (114)K.: "çwnky"
 (115)K.: "lfzy"
 P. û B.: "lefzî"
 (116)B.: "bikein"
 (117)"T" y na kelîma qalîn vajiyêno, cuwe ra mi bi di "T"yan nuşti.
 (118)K.: "lfzy"
 P. û B.: "lefzî"
 (119)K.: "bkyn"
 B.: "biken"
 (120)B.: "am"
 (121)K.: "dyantky"
 B.: "dianetek(e)-i"
 (122)K.: "yhwr" (Wina fam beno ki tekstî bi xwi di na kelîma şas nusiyaya.)
 B.: "Yehûd"
 (123)K.: "zdayt"
 B.: "ziddiyatî"
 P.: "ziddayetî"
 (124)B.: "dianetî"
 (125)P. û B.: "emri"
 (126)K.: "xas"
 B.: "xass"
 P.: "xassi"
 (127)B.: "binein"
 (128)P. û B.: "İlah"
 (129)B.: "yaxod"
 (130)K.: "eknwn"
 B.: "eknûn"
 P.: "eken wun"
 (131)K.: "babl"
 B.: "Babel"
 (132)K.: "Axşwrs"
 B.: "Exeşwiroş"
 (133)K.: "Axrñqalws"
 B.: "Exrinqalos"
 P.: "İxrñqelus"
 (134)K.: "kştykh"
 B.: "keştiéki"
 P.: "keştiyeke" (Notê Pêşrewî di: "keştiyeke" yan zî "keştiyekey")
 (135)Tekst bi xwi di na kelîma ra pey herfa "Y" nusiyaya, labelê îptal biya.
 (136)B.: "da"
 (137)K.: "pylqhyky"
 B.: "pêleqe-éki"
 (138)K.: "waylw"
 B.: "wâ-äi l-aw" [we-ey l-ew]
 P.: "way l-ew"
 (139)K.: "rnky" (Beno ki na kelîma herinda kelîmâ "nirkey" di nusiyaya.)
 B.: "dengî"
 P.: "rinnekî"
 (140)K.: "grdanh"
 B.: "gerdane"
 P.: "girdane"
 (141)K.: "ddkly"
 P. û B.: "dûkeli"
 (142)K.: "asman"
 B.: "asmane"
 (143)Tekst bi xwi di tiya di herfê "kyd" nusiyay, labelê ser û bin ê nê herfan di yew xêzeki kaşbiya, wina fam beno ki nê herfi îptal biy.
 (144)K.: "kwlkh"
 B.: "kûleke"
 P.: "koleke"
 (145)B.: "da"
 (146)P. û B.: "erzi"
 (147)K.: "qfl"
 B.: "qefel"
 P.: "qufl"
 (148)K.: "nwsyty"
 P. û B.: "nûsimî"
 (149)B.: "da"
 (150)K.: "çrayh"
 P.: "çiray"
 (151)K.: "çrayy"
 P.: "çiray"
 B.: "çirayı"
 (152)K.: "dabgrsyny"
 B.: "agir bisenîwe"
 (153)B.: "bû (b-o, b-au)"
 (154)K.: "xray" (Wina fam beno ki tekstî bi xwi di na kelîma şas nusiyaya.)
 B.: "Xudayî"
 P.: "çray" (Notê Pêşrewî di: "Xuday")
 (155)K.: "bw"
 P.: "bû be"
 (156)K.: "çwarm"
 B.: "çwarim"
 P.: "çuwarem"
 (157)B.: "pencim"
 (158)B.: "şisim"
 (159)K.: "frxy" (frgy)
 B.: "ferxî"
 Tadayey 'Erebkî yê Meshefi Reşî di: "ferax"

Mantiqê dûz

destpêk r: 4

Sisê; li Afrika başûr hereketa li dijî nijadperestiyê, yanî ANC (Kongreya Neteweyî ya Afrikayê) hereketekê çep e û di nava vê hereketê de, ew komünîstên "bê serî" ji hene. Di hukûmeta Mandela ya ku ji aliyê dinyayê ve tê qebûlkirin û destekkirin de, gelek wezîrên ku endamên Partiya Komünîst ya Afrika Başûr in, cih stendine; alikarê Serokkomar Thabo Mbeki (endamê Buroya Polîtik ya Partiya Komünîst ya Afrika Başûr-PKAB), Wezîr Polîsan Sydney Mufamadi (endamê Buroya Polîtik ya Partiya Komünîst ya Afrika Başûr), Wezîr Avahiyê Joe Slovo (ji 1942-an û vir de endamê PKAB; di 1985-an de serokê PKAB û beriya Chris Hani ji yanî di 1987-an de Sekreterê Giştî yê PKAB), Wezîr Karû-barê Resmî Jeff Radebe (endamê PKAB û li ser navê ANC, serokê herêma Başûrê Natal) û hwd... Lî tev vê rewşê ji pirraniya quwetên ku li dinyayê xwedî peyv in, alikariya wan kirin û hîn ji dikin û di piştigiriyê de tu texsîrî nekirin. Ger em bi mantiqê S. E. hereket bikin, divê ANC ji ber hebûna komu-nîstan, ji dinyayê tecrit bûbuya. Ev yek, ji bo Filistîniyan ji derbas dibe. Di nava hereketa rizgarxwaz a filistîne de, hem hereketîn çep û hem ji yê baskê rast hene, lî tev vê ji dinya ji wan nareve. Gelo wê ji bo çi dinya ji cepen me bireve? Ger em çep hereketîn "te-roristî" nekin û ji hereketîn teroristîyê birevin, em ê bikaribin li regeyên cuda bingerin û bi dinyare li ser tiştê bingehîn li hev bikin û xwe bi wan bidin qebûlkirin. Ka lê bini-hîrin bê diplomatik Amerikanî ci dibêje: "Ji bo çi emê li başûrê rojhilata Anadoliye sistemeke nuh û welatekî nuh bixwazin, tu tiştê ku ji me re dibe asteng nîne." Hînek welat bi şeweyekî aktiv alikariya Kurdan nakin. Ev ne ji ber çepitiya me tê; ji ber ku interesên dewlatan weha dixwaze; icaba menfaetên wan ev e. Lî teva vê yekê ji divê em siyaseteke rast, xwedî perspektif û tekûz bimeşîne da ku em bikaribin xwe bi dinyayê bidin qebûlkirin. (Ez ê di rojên pêş de li ser siyasta derve binivîsinim. Ew nîvîs dê ji aliyeke bibe rexneyê ji bo tesbîtkirina "dost dijmin" ên S. E.)

Çar, min li jor diyar kir ku lênerînê me yê sosyalist ji bo avakirina dezgehîn neteweyî ne asteng in. Di nava dezgehîn neteweyî de her lênerîn cih digre. Ew dezgeh di esasê xwe de interesên welêt diparêzin û wan bi pêş de dibin; li gora kararen pîraniyê û li gora programên xwe hereket dikin û fonksiyonên xwe bi cih tînin û hwd... Gelo em sos-

yalîst ne welatparêz in? Bi kêmanî, em sosyalist ji dixwazin di nava dezgehîn neteweyî de cih bistînîn û xebata me ji ji bo vê yekê ye. Gava mirov li dezgehîn neteweyî dinere, mirov dibine ku sosyalîstan di nava wan de cih sitendine û di xebata damezirandina wan de, sosyalist ji hene. wek mînak: Federasyona Komeleyê Kurdistanê li Swêdê. Na, S. E. dixwaze em lênerînê xwe têxin sarincê û ançax pişti rizgariya Kurdistanê em ê bikaribin wan ji sarincê derxînîn. Me doh ji monopoliya baskê çep gelek êş kişand, lê S. Esmer içar monopoliyeke din diparêze. Diyar e, wî ji wan êşen me ders nestendiye. Gelo em ê ji bo çi pirdeniyê neparêzin û jê birevin? Ez weke sosyalîstekî, pirdengiyê dipa-rezim. Xwestineke wek xwestina S. E. ya ku ji bo aliyeke civata me lênerînê xwe têxe sarincê, li dijî peymanen navneteweyî yên di derheqa mafen mirovan de ye. Di nava wan peymanen de azadiya mafan lênerînen cûda, yek ji wan mafen bingehîn e. Ji xwe diktatorî ji xwestinê wisa dest pê dike; dibêjin "İro ne dema parastina fîkrîn weha ye" û pişti wê yan ji bi wê re darê zorê tê.. Bihêlin, "bila cil lênerîn li hemberî hev ser bikin û ew wek bexçê gulan ges bibin". Divê em bikaribin bi cûdabûna xwe, bi hevdû re Kudistana xwe azad bikin û wê ava bikin. Ev e piirrdengî..

5- "Lê iro li dinyayê pêvajoyeke nû dest pêkiriye, em weke Kurd nikarin pêşengîya vê pêvajoye bikin û lêkolîn li ser nûjêniya idolojiya sosyalîzmê bikin". (S. E.)

Bi rastî sosyalîstên Kurdistanê negotine ku "em ê li dinyayê pêşengîya pêvajoyeke nûh bikin. " İddiayeke wisa ne di cih de ye. Ji xwe cîlinya me de cihê pêşengîya idolojiya tune ye. Her sosyalist wê li welatê xwe, li gorşert û şirûdên xwe pêşengîya idolojiya xwe bikin û divê bikin. Lî Kurd ji wê li gora taqet û hêza xwe, lêkolînê li ser idolojiya xwe bikin û lênerînê xwe kür û fireh bikin. Ev mafekî tabiiyê. Li Kurdistanê, bê çawa mafê baskê rast heye, mafê baskê çep ji heye. Divê S. E: bersiva vêya bide: Ger Kurdên sosyalist nikaribin li ser lênerînê xwe lêkolînan bikin", gelo wê ên baskê rast çawa bikaribin li ser lênerînê xwe lêkolînan bikin? Ya divê ew ji nikaribin, ya ji divê ev heq ji her aliyeke civata me re bê naskirin. Ger ne weha be, wê gavê divê em li bende hînekî din bin, heta ku hînek ji ser hevvê bêñ û li ser problemen me lêkolînan bikin, ya ji divê em çend babaegitan ji Swêdê bişinîn

Kurdîstanê....

Gava min ev meqala S. E. xwend, hat bîra min ku min lênerîneke wisa di ko-vareke din ya Kurdan de xwendibû: " Ma sosyalîzm ji me Kurdan re maye, em ê wê biparêzin" Tu cûdabûna vê lênerînê û ya S. E. nîne. Xuyaye, ji dervayî ristên formel, haya van kesan qet ji dinyayê tuneye. Divê qey li vê dinyayê sosyalist hew Kurd bi tenê ne.

6- " Ne rêxistineke nû bi navê sosyalîzmê çêbûye, ne ji tu alemek nû rabûye gotiye; pişti pêncî salên din wê aqûbeta sosyalîzmê weha be" (S. E.) Xuyaye S. E. ne li lêkolîn û perspektifîn sosyalîzmê yên pêşerojê digere, ew li lênerînê kayinan digere; rast e, kayinân wisa di nava sosyalîstan de tuneye. Gelo kî dizane bê wê dinya me ya wek hêkê, pêncî salên din ci şeweyî bistûne? Rexistinê nû yên sosyalist pirr bûne, mirov dikare ne bi rastbûna wan re be, lê iddiaya "ne rêxistineke nû bi navê sosyalîzme çêbûye..." beriya hertişî nezaniyeke mezin e.

Diyar e ku "%2" dêng zêde dengwergirtina parti-yê sosyalist yên wan welatên Ewrûpaya Rojhîlat, S. E. pirr aciz kiriye. Rast e, ne ew bi tenê aciz dibe, hemû lênerînê baskê rast pirr aciz dibin û dibêjin: " Ev encamên hilbijartînê li van welatan, ji ber ketina standarda jiyana wan gelan e; ev ji reaksiyonâ wan e".

Mirov dikare sedemên encaman munaqese bike. Ger ev reaksiyonek be û ne servketina lênerînê çep be, gelo doh, gava sosyalîstan di hilbijartînê yekem de wenda kirin, ji bo çi ew encam mîna mirina lênerînê sosyalit dihat nirxandin? Bila lênerînê baskê rast aciz nebe, ev hilbijartîn e, mirov wenda ji dike û bi ser ji dikeve. Ma ev ne lisk, qâide û şertê demokrasiyê ye? Belê, gava sosyalist bi ser kevin, kîfa me tê û bê çawa gava sosyalist wenda dikin, divê em ji wan wendakirinan derşan bistîne, em dixwazin ji servketina wan ji dersan bistînîn. Em di dinyayêke integrê de dijin. Ji bo vê yekê ji be, lênerînê nêzîki me, me gelekî elaqeder dike, em nikarin ji derveyî pêvajoya dinyayê bimînin. Ji ber vê yekê, em nikarin bibêjin "em Kurd in û hew". Rast e, em Kurd in, lê em civatek in û wê intereseyê me yên cuda hebin. Ev intereseyê cuda, di hereket û lênerînê cûda de derdikevin ortê. Divê em di warê intereseyê neteweyî de, bi hevdû re bin, lê intereseyê çînî û grûbî ji nayêñ inkarkirin.


Pirs pirsa têgihiştina pir-dengiyê ye. Ger em ji pir-dengiyê bawer dike, wê gavê em dikarin bi dîlfirehî rekabeta ramanan bikin.

Radyoya PENCERE Stockholm

Yekşem: 21.00-24.00
Sêşem: 13.00-15.00
Înê: 13.00-15.00

Li ser pêla FM 88,9 MHz

Tel: 08-19 21 70
08-19 51 70



Em di salvegera sêyem a
şehîdbûna

Vedat Aydin

û kesen ku di merasima
cenazê wî de şehîd ketin
bi giramî bi bîr tînin.

Armanc

Kultur û Politika

Riza Polat

"Hafizayê beser bi nisyan malûl e"

Diyar e Kurdên Kurdistana Başûr gelekk zû zehmetî û eziyetên jîyana berî çend salan ji bîr kirin. Lî yên ku ji nêzik ve tevgera gelê Kurd nasdikirin texmîn nedikirin ku kurdên me wê carake din wiha zû wan êş û tehlîtiya ku kişandine wê ji bîrbikin. Lî weha xuya dike ku kurdên me yên Başûrê Kurdistanê gotineke pêşîyan ya Ereban tesdiq dikin. Sernivisa jorîn gotineke pêşîyan a Ereban e û teqrîben tê vê maneyê: ji ber ku mirov tiştan ji bîr dike hafiza mirovî seget e.

Tevgera gelê Kurd û kadroyen Kurdistanâ Başûr di salên 80'yi de piir bê imkan û bê taqet bû. Di qada navnetewi de xudanê eleqetên gelekk gels û bê imkan bûn. Carna Celal Talebanî û Mesûd Barzanî bi mehan li Sûriyê yan ji li Îranê bende diman ku welatek Ewrûpayê vîzeyekê bide wan da ku ji bo derkevin derveyî welêt, kar û barê xwe bimeşîn. Bi rojan û bi mehan li ber Suriyê, Lîbyayê û Îranê digeriyan ku hetanî hinek îmkânî ji wan bi destxîn. Merhûm Îdrîs Barzanî bi mehan li Lîbyayê bende dima ku hetanî alîkayê ji Muamer Kaddafi bistûne.

Lî pişî şerê Xelîcê ji bo Kurdan şertên baş li herêmê û li dînyayê pêkhatin. Rayagîşti ya Ewrûpayê û Emerîkayê ihtiamek mezin dan pirsa gelê Kurd. Bi saya serê wan şertan û rayagîşti rîyênuh li pêşîya tevgera gelê Kurd vebûn.

Pişî demek kin dîyar bû ku berpirsiyaren siyasi yên Kurdistanâ Başûr hê ji tê negîhiştine ku ew atmosfera qenc ya ji bo kurdan pêkhatî ne ji encama maharet û ji jîrbûna wan e. Lî mixabin weha diyar e ku têkçûn û belavbûna wan şertan baş wê bi encama "maharet û jîrbûna" siyasetmedarên Kurdan be. Şertan weha piir kim caran pêk tê. Di dema şerê cihanê yê yekemîn û duwemîn de, firseten wek iro yên dîrokî ji destê Kurdan reviyan. Piir kesan berê ji û iro ji, ji istifadekirina şerten wiha wek zeifiya Kurdan hesibandin û Kurd wek destikê xerbê dîtin û hêji dibîn. Lî dema mirov bi aqleke selim li dîrokê binêre, piraniya gel û welatên ku iro azad bûne bi saya serê şerten weha azad bûne û dewletên xwe ava kirine. Ji bo kurdan ji ne sûce ku ew ji wek gelên din ji wan mercan istifade bikin û li ser erdê bay û kalên xwe dewleta xwe avabikin.

Istifadekirin ji şerten weha ji bo kurdan her tim zehmet bûye. Sebebê zehmetiyê ne tenê ji bêtaqetî û zeifiya kurdan e. Sedemeke bingehî ewe ku di merkeza siyaset avakirina siyasetmedarên kurdan de hesabê biçûk, hîç û pûç her tim roleke esasî listin e. Ma gelo Celal Talebanî û Mesûd Barzanî ji wek her kurdeke hesab û pilanê wan devletên dijmin, yên li ser Kurdistanâ nabînin, yan ji pê nahezin? Bê şik siyasetmedarên me kurdan yên ku bi salan di wê herêmê de siyaset avakirine û meşandine wê

wan dek û dolaban baş bizanibin. Celal Talebanî û Mesûd Barzanî ji baş dizinan ku dewletên ku Kurd li bin nîrên wan dijîn wek gurên har dora wê girava azad diçin û tê. Carna ji bo hesabê biçûk mirov armanc û wezifeyen xwe yên millî dixe bin piyan û dide aliyeke.

Di roja iroyîn de terefgirtin di şerê birakujiyê de ne di berjewendiya gelê Kurd de ye. Lî ev nayê wê manê ku kîmasî û xeletiyen bûne neyên ziman. Eve mehek e malûmaten ku her du alî belav dikin û digîn raya giştî, ji bo fîmkirina sedemên şer ne kafî ne. Lî ji hinek helwest û kîrinên terefan mirov dikare sedemên şerî ji derxe. Ma gelo kî dikare bide xuyakirin ku ji bo çi di dema herî xerab de Celal Talebanî xwe li Sûriyê giran kir û derbasî Kurdistanê ne bû?

Ji helwesten YNK û Celal Talebanî qinaetek li cem mirov hasil dibe ku ew naxwazin şer bisekine. Giranîya şer li deveren ku Yekîti Nîstimanî Kurdistan xurt e rûdidin. Lî li deveren ku Partî Demokratî Kurdistan xurt e nûçeyen şer kêm in. Her wisa ablûqekirina Parlamento ya Nîstimanî ya Kurdistanê li paytext, li Hewlîrê ji wê qineîte testiq dike. Ez texmîn dikim ku li cem gelek Kurdan û dos-tan gelê Kurd, hîcîten mayîna Celal Talebanî li Sûriyê û derbasnebûna wî bo Kurdistanê ne ber bi aqil in. Celal Talebanî pêşîniyariya Hêza Çakûc ya ji bo derbâzkirina wî bo Kurdistanê qebûl nekir. Her wisa dawetên Mesûd Barzanî ji qebûl nekirin. Lî çê xerîbe ku dawîya dawîyê ji Tirkîyê derbasî Kurdistanê bû. Ew helwesta wî ji bo serokeki ku di siyasete de bi iddia, kîmasiyek piir mezin bû. Di bin serokîya Tirkîyê de civîn çêkirin ji qelsiyek tevgera gelê Kurd ya teybîtî bû.

Helwesta YNK ya ji bo hilbijartînê li Kurdistanê ji ciyê şikê ye. Wek tê xuyakirin YNK, hilbijartînê nuh li gor menfeeta xwe nabine. Ci xerîbe ku di wê pişî de helwesta YNK û ya Tirkîyê wek hev e. Gelek eşkereye ku Tirkîyê ji naxwaze li Kurdistanâ Başûr hilbijartînê çêbe. Berbirsiyare Wezareta Derve ya Tirkîyê, Ferhat Ataman ji da diyakirin her hilbijartîneke nuh Kurdistanê fiillî li herêmê ava dike.

Pişî wî şerê birakujiyê, imaj û intibaya ku Kurdan ji şerê sê salan bu di şerê xelk, dost û hevalbendên xwedî cî kiribûn yekser berbivajî bû. Lî hêvî ew e ku Kurd ji, ne wek Tirkîyê û hinek welatên paşdemayî ji bo raya giştî ya Ewrûpa, Amerîka û dostan xwe dawîya şer bînîn; Kurd ji bo menfeet û meslehetên xwe û ji bo welateke azad pêwîstîya dawîanîna şer bibîn. Çunkî ku iro ji bo xatirê dostan xwe şer bisekinîn, dikarin sibî ji bo xatirê wan carake din dest bi bikin.

BEROS

Mahmûd Lewendî

Ne tayek, lê çend tayên sipî

Bi navê "tayek porê sipî" kurteçirokeke Qedri Can heye. Wexta min xwend pir tesirek mezin li min kir. Ez bawer im ger hûn bixwînin wê tesîrê li we -yên ku êdî salên wî nêzî 40'î ne- ji bike. Ew bi awayekî welê tarîfa wî tayê sipî yê ku di nav porê wî yê res de derketiye dike ku çawa wek şürkêşê ruhistîn li ser serê wî digere.

Hercendî li gor îrsiyetê ye ji, lê porê hinekan zûtir sipî dibin. Yan na di normala xwe de pişî 35'an êdî yeko yeko mirov di nav porê xwe de rastî çend tayên sipî tê.

Min 35 derbaskir, İcar ne çend ta, belkî 30-40 tayên sipî di nav porê minê res i qûl de wek nêriyên pîvazên zîlavâtî yên nav baxçeyan, gişan serên xwe hildane.

Di destpêkê de yek-du ta bûn, min bi destan hildikişandin, yanê min zora wan dibir, lê paşê ez lê var-qîlîm ku te digot qey qereza wan bi min re heye, min tayek hildikişand, du tayên hê sipîtir li şûna wî tayî hişin dihatin. Min nihîrt ku ez bi dest û pêşîyan di ber re dernakevim, İcar wek palîya genimê sor ku çawa meriv dide ber dasan, wele ez ji bi müçingê ketim nav porê xwe, û Xwedê go "yallah" û de bidê, ha ji min û ha ji wan, wele min koka wan qeland. Di nav wî porê min ê res-i xweşikî birqokî de ji bo derman be ji tayek sipî nema. İcar kîfa min dihat. Ez ji wan xelas bûbûm.

Lî ci? Mehek di ser re derbas nebû, li ber eynikê min hew dît ku di şûna wan tayên sipî de İcar çend ta serî hil didin. Ya rebî ev ci bela bû? Her ku diçe ji zêdetir dibin. Welleh İcar ji min maqes girt û ez ketim nav porê xwe, yeko yeko min ew tayên sipî ji kok de birrîn, carna çend tayên res ji diketin ber, lê tişt nabe, hêjayî wê yekê bû. Lî pişî demekê disa nebû. Ez çûm berber, min porê xwe hinekî kurt kir, tu nabê ew tayên sipî yên ku min bi maqesê ji kok de birribûn, hêdi hêdi serî hildabûn. Ü malixerabê berber ji heta jê hat porê min kurt kir, anî qiyasa wan tayên sipî. Na, min nihîrt xelasî tun-

eye. Ez nîva-nîv teslim bûm.

Nizanim ezê ci bikim?

Malmîrata rengê res û sipî ji li ser serê merivan qet li hev nakin. Gerçi carna kîfa xwe tînim û dibêjîm "de tişt nabe lo, hema bila neweş, ji sipîbûnê re care heye, ezê boyax kim". Lî kanê ew cesaret. Ew cesareta ku tu rabî porê xwe boyax bikî û bi wê boyaxa res a ku pişî demekê wê dîsa bibe binsipî, biçî nav hevalan. Na lo ezê boyax nekim! İcar hûn nebêjin "çima?". Belki ji hun nebêjin "çima?". Lî ez ji nizanim çima?

Jin porê xwe boyax dikan. Hem ji bi awayen welê boyax dikan ku porê res i qûl werdigerîn rengê zerî zerolankî. Carna nîv res û nîv zer ku ew bi xwe di nav xwe de bi zimanê jinan jê re dibêjin "meç". Yan ji porê xwe sor dikan, hinneyê tê didin, axirkê yanê ez serê we neêşîm tiştê nemayî bi serê porê xwe de tînin û em ji wek mîr qet dengê xwe nakin û bi ser de -ne ji dil be ji- em dibêjin "ci xweş bûye, çiqas li te hatiye, her tim weha boyax ke" û hwd.

Nebû, ne? Hun nuha dibêjin "ma ev ji sebeb e". Baş e bavo, em dev ji jinan berdin. Em dîsa vegeerin ser xwe mîran. Yan ji na na! Bisekinin ezê ji we re piçekî qala nexwesi û çareyên wan bikim. De İcar ji nebêjin "ma nexwesi û por?"

Nuha gava ku yek bi bapêşê bîkeve ewê here doktor û wê hin dermanan bikire û bixwe ji bo ku ji wê nexwesiya xwe xelas be. Yan ji qezayekî derbaske û di wê qezayê de pozê wî bişkê, wê jê re derman bîkin û pist re ji wê pozê wî bi emeliyateke estetikî jê re rast bikin. Yan ji diranê camêr ne sipî ne, diçe ser doktor jê re sipî dike. İcar e min ji porê min sipî bûye ez dixwazim herim ser doktoreki dâkû res bike. E de Xwedê hebînî ji viya normaltir çi heye, ku xelk ji merivan re dikan ecêbek giran.

Ero hun dibînin ne! Derdê min ji qet nayê kişandin!

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

-Li Amerîka 2 milyon karkir 10 milyon otomobil çedikin. Li Japonyayê 670 000 karkir 11 milyon otomobil çedikin.

-Roj dirêjtir dibin, ji ber ku dinya wek berê bi lez nazîvire. 600 000 sal berê rojek tenê 21 seet bûye.

-Zarokê/a di rehma jina ku cara yekemîn bi hemle dibe, di hefta 20'emîn de dest bi hereketê dike. Lî jina ku cara duemîn bi hemle dikeve, zarok di rehma wê de, di hefta 18'emîn de dest bi hereketê dike.

-Anîna zarokeki ji bo jina ku cara yekemîn zarok tîne 18 seet dikşîne û ji bo jina ku cara duemîn zarok tîne 12 seet dikşîne.

-Jinê bi hemle (bi zarok-ducanî) %20 zêdetir oksijen digre. Ji ber wê yekê ji plasma xwînê ji zêde dibe.

-Mezinahiya dinê 14.900 milyar km